



Kî ne û çî ne?

Gelo kî ne yên bi dehan salan girtî... Wijdana me yê civakî yê bi daxuyanî û bendewariyan bi salan e teviziye û xwe têr dibîne divê bi rexneyên dijwar xwe zelal û paqij bike. Yên girtî xwişk, bira, dê û bavên me ne... *Dilan Aydın / R.8*



Tim 'Evîn'dar bû!

Rojnamegera kurd Evîn Bûldan tenê 27 salan jiya lê jiyanê wê pirbar bû. Jiyan kurt an jî dirêj rojekê yê bigehêje baregeha xwe ya dawiyê, lê di 'qamûsa wijdanê' de navê mirovên hêja û xwedî armanc nayên jibîrkirin... *Kakgar Dremar / R.8*



Dêreyê belek

Ji bo dawetê çend rojek mabûn ku li seranserê cihanê nexweşiyek peyda bû. Gotin bila herkes di malên xwe de bin, kesek dernekeve derve û hevûdu hembêz nekin. Rojekê hemû gundî û cîran bi dengê muzîkê govendê hişyar bûn... *Kawê Redkan / R.10*

Rojnameya Heftane

xwebûn

www.xwebun.org

30 Adar-5 Nisan 2020

Hejmar: 15

Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org

Yew dewe yew însan

Dinya yew dew a. Heta nika ena qal ser zaf qalî ameyî vatêne. Eka dinya raştî zî bîya yew dewe. Eka herçiqas ke ma vajî, dinya yew dew nîya zî dinya yew însan tenya va. Raştî de heme însanî yew tenî. Yew nêweşî nêweşîya ma heminan a. Na nêweşîye beno ke biba nêweşîyêka globale. Nika ma heme vanî ke ma xo nêweşîye ra seyî bipavî. Heta eka devletê hegomonîkî reçete dayêne ma... *Av. Cemile Turhallî / R.9*

Rojava pê-naseya min a herî zelal û berdest e

Helbestvan Ehmedê Huseynî pirsên rojnameya me bersivand û wiha got: "Rojava pê-naseya min û bûneweriya min a herî zelal û berdest e. Rojava wek xewn, wek giyan, wek ax û wek azmûneke giyanî diparêzim. Tiştêkî pir seyr û balkêş e, çawan helbestvanek, dema ku derfet hebe, dikare dûrî êşa welatê xwe bijî? Çawan dikare ji paş deryayan li wê êşê temaşa bike, wê êşê derbibire

bêyî ku di naveroka wê êşê de bijî?" Huseynî balkişand ser girîngiya ziman û wiha axivî: "Rola min ew e ku zimanê xwe di derbirîne de bigihînim asta herî dawîn, ku xeyalê ji bandora zimanên dagirkeran rizgar bikim, ku hestên xwe bi ava zelal û pîroz a Melayê Cizîrî bişom, ku xeyala xwe bi Şakiro, Mihemed Arif û Fadiî Cizîrî ji nû ve ava bikim... *Hevpeyvîn Rizoyê Xerzî / RÛPEL-4*



Tedbîr ne zanistî ne, polîtîk in

Dîrokçeya hîjyenê

Hîjyen jî yek ji wan terman e ku bivê nevwê dîsa kete rojevê. Ev peyv bi xwe, bi wateya ku em îro bi kar tînin konseptê nû ye. Ji hêla etîmolojîyê ve ji peyveke yewnanî ya latînzekirî tê ku tê maneya hunera tenduristiyê. Êdî bi wateya paqijiyê tê xebitandin lê eseh maneya wê ji vêya firehtir e. Tê wateya hemû tiştên ku ji bo paqijiyê tên kirin. Bi vê nivîsê ez ê li dîrokçeya hîjyenê ya li Ewropayê binêrim... *Bilal Ata Aktaş / R.12*



Li seranserê cihanê hejmara kesên ku ji ber vîrusa koronayê (Kovîd 19) dimirin her roj girantir dibe. Nêzî 30 hezar kes mirin û zêdetirî 500 hezar kes bi vîrusê nexweşiyê ketin. Li Kurdistanê vîrusê berbelav dibe û rayedarên dewleta tirk têkildarî nexweşiyê agahiyên rast nadin. Doktor Ozgur Bîngol got ku vîrusê pergala kapîtalîst hejand û heke derman û aşiyek neyê dîtin dê gelek kes bimirin. Bîngol xwest welatî ji malê xwe dernekevin û tedbîrên ku dewlet digire ji pir kêr in û polîtîk in ne zanistî ne... *RÛPEL-7*

Şewata di nameyan de

A girîng feraset û dilnizmî ye, ya ku her ku diçe kêmtir dibe û pozpîlîndiyê ku hêza xwe ji famkoriyê vegir digire, tê û dikeve şûnê. "Ji ber ku ji hêla zanî û xuypakiyê ve xwe ji we gelek û gelek kêr dibînim, newêrekiya min bibexşînin." Em ji nameyê têdîgihînin wekî Stî Tanînê, gelş û gelemşeyên gelê xwe, weke pirsgirêkeke neteweyî û hiqûqê didît... *Şener Ozmen - R.11*

Girtî bi vîrusê re rûbirû hatine hiştin û divê serbest bînin berdan... *RÛPEL-6*

Vîrusê digihînin demokratîkbûnê jî



Dewleta tirk û hikûmeta AKP'ê 8 şaredariyên din ên di destê HDP'ê de desteser kir û qeyûm tayînî şûna hevşaredarên wan kir. Bi vî yekê hejmara şaredariyên HDP'ê yê desteser kirî derket 40'î û tenê 18 şaredarî di destê HDP'ê de man. Platforma Ked û Demokrasiyê jî tayînkirina qeyûman şiband vîrusê û destnîşan kirin ku bi tayînkirina qeyûman vîrusê digihînin demokratîkbûna Tirkiyeyê û xwest dest ji dijminantiya kurdan berdin. Xebata Tifaqa Kurdistanî jî bi daxuyaniyê nivîskî bertek nîşanî tayînkirina qeyûman da... *RÛPEL-3*

Komediyê çar kom gihandin hev

Komên şanoyê; Teatra Jiyana Nû, Şanoya Bajêr a Amedê, Tiyatro Mencil û Şanoya Yekta li ser medyaya civakî û televîzyonê amadekariya bernameyê komediyê dikin. Hemû kes dikarin skeçên ku nivîsandine ji şanogeran re bişînin... *R.11*



Cîrantî wêneyê civakbûnê ye

Cîran sebr û aramiya cîran bû. Cîran ji bo cîran dost û yar bû. Ji ber vê yekê gelek tişt li ser hatine gotin

Dîlan Ertaş

Mirovên ku wekî qebîleyan jiyana xwe berdewam dikirin, hêdî hêdî ji şikeft û berqafan derbasî gundan dibûn. Ax bêtir nas dikirin û ji axê berhemên jiyane diafirandin. Ji bo xwe ji serma û germahiyê biparêzin û dîsa ji bo xwe ji sewalên goştur ên dirinde biparêzin, kevir bi teşe kirin û xanî ava kirin. Ax kirin kerpîç û bi kerpîçan xanî ava kirin. Piştî mirov li gundan di xaniyan de bi cih bûn, bêtir pêdiviya wan bi yekîti, tifaq û hevkarîya hev hebûn. Xaniyên wan bi hev ve bûn. Deriyê hewşa xaniyan di deriyê hev de bûn. Cîrantî li pêş bû.

Çanda cîrantîyê ji serdema neolîtîkê dest pê dike. Piştî mirov bi şûn û war bû û dest bi cotkarî û çandîniyê kir, wê demê çanda cîrantîyê bi pêş ket. Bingeha civakbûnê bi cîrantîyê dest pê dike. Li ser cîrantîyê gelek gotinên pêşiyên hene. Dema ku em li gotinên pêşiyên dinêrîn em dibînin ku cîrantî ji bo mirovan û di nav civakê de çiqas girîng e.

Cîrantî wêneyê civakbûna Kurdistanê û Rojhilata Navîn e. Li ser axa Toros-Zagrosan kok berdaye û xwe ava kiriye. Di nav civaka kurd û Rojhilata Navîn de cihê cîrantîyê cihêkî taybet e. Pêşiyên li ser cîrantîyê bi pênasîyên



wekî 'Bê cih dibe, lê bê cîran nabe, Cîranê baş ji birayê xerab çêtir e, Cîranê nebaş striyê ber çavê mirov e, Cîran bi halê cîran dizane, Cîran deriyê malê ye, Cîran beriya bira ye, Cîran hewceyî derziya cîran e, Cîran hewceyî cîran e, Cîran neynika cîran e, Cîran wêrisê cîran e, Cîran mîratxurê cîran e, Cîranê çêyo bav û dêyo...' û hwd. girîngî û wateya cîrantîyê anîne ziman. Cîrantî mîdela jiyana komînal e.

Cîrantî hîma Modernîteya Demokratîk e. Hemû nîrxên civakbûnê di genetîka cîrantîyê de veşartî ne. Civakbûn li ser cîrantîyê, cîrantî li ser çanda gundewariyê bi pêş ketiye. Cîrantîya li gund û taxan xurt e. Cîranan êş, şahî, xemgînî, xizanî, dewlemendî, nexweşî, kul, keder, kele-

can, evîn û kêfxweşiyên xwe bi cîranên xwe re parve dikirin. Roja cîranan hevdu nedîtina xwe kêm hîs dikirin. Roja çav li çavan neketana, roja sewta cîran li guhê cîran neketana xwe di valahiyê de û bê aram hîs dikirin. Cîran sebr û aramiya cîran bû. Cîran ji bo cîran dost û yar bû. Ji ber vê yekê gelek tişt li ser hatine gotin. Lê îro em dinêrîn mirov bêtir berê xwe dide bajar û metropolan; berê xwe didin Ewropayê; berê xwe didin wargehên ku her tişt biyanî ne. Ziman û çand biyanî, rû û ruh biyanî, girî û ken biyanî, her tişt biyanî. Xwe di daîreyên beton û cam de hepis dîkin. Di korîdarên apartmanan de ji silav nadin hev. Cîran cîran nas nake. Cîran silav nade cîran. Ne ruh û ne çav temasî cîran nake.

Kengî mirovan berê xwe da bajêr, ruhê cîrantîyê mir. Kengî berê xwe da bajêr çanda cîrantîyê wenda kir. Li şûna berê xwe bidin cîranên xwe, berên xwe dan xwe. Kengî mirovan ruh û çanda cîrantîyê wenda kirin, ji nîrxên civakbûnê qut bûn. Ji nîrxên cîrantîyê qut bûn. Dema hêk, rûn, xwê, şekir lazim dibû me berê xwe dida cîranên xwe. Dema ta û terzî lazim dibûn me berê xwe dida cîranên xwe. Dema tevşo, birek, çakûç û pêdiviyek din lazim dibû me berê xwe dida cîranên xwe. Lê îro piştî em hatin bajêr, êdî em li şûna berê xwe bidin cîranên xwe, em berê xwe didin market, dikan û navendên danûstandinan. Gelo îro ji bo me cîran ferz e yan AVM? Kijan di rojên zor û zehmet de dê bi hawara me de bîn?

Xerîbiya awêneyê

Mizgîn Ronak

Bi çavên xerîban li te dimêzîne yan ji bi çavên xerîb, ecêb, kor, nîvkor, şaşwaz... Kî ye ya ku bi çavên ecêb û elewat, ji nav xerîbî û nenasiya bêdawi li te dimêzîne, di tevî awêneyan de? Ev demek dirêj e, tu bi xerîba di awêneyan de hesiyayî. Tu tam dema wê nizanîbî ji rojek te hew dît ku wa ya di awêneyan de li te dimêzîne xerîb e... Paşê tu hinek vecinîqî, paşê te got "Na lê! Tiştê wiha nabe. Way wêya ez im û li xwe dimêzînim û ew li min dimêzîne." Tu zêde li ser nesekîni ji. Lê her cara te li awêneyan mêze kir; tu rastî wê xerîba ecêb hatî. Westiyayî bû, bêdeng bû, bênavnîşan bû li te dinêrî. An ji bê nasname... Te nizanîbû ew kî ye, wê nizanîbû tu kî yî? Te nizanîbû hûn ji kengê ve bûne xerîbên hev û çima? Çima hevnaşin qediyaye?

*Wîsa xerîb neyê ji min re ey xerîbî
di awêneyan de melûl melûl
Bêje kî me kir xerîbên hev
li gorî ku çavên min li serê te
yên te ji li serê min in em ji derek digibîjin hev
lê çima tu wîsa xerîb î û ken bi rîyê te nakeve
wekî ku tu qet nekeniyabî ey xerîbî!
Tim wiha westandî û matmayî bî li awêneyan
wekî ku tu û rîyê xwe
rîyê min
zanîngeha xerîbîyê bin
xerîbîyek bêken
Qey xerîbî timî nikare bikene wiha
di awêneyan de...
14. 01. 2020*

Tu pênc roj û şevên dirêj kuştî mayî lê ji bo nekevi bin axê, du heval ji ber serê te ranebûn. Dema tu dihatî ser hemdê xwe, awêne dihat bîra te, te dixwest rûyê xwe bibîni. Wê xerîbê, wê nasê! Lê tu wîsa bêmecal bûy ku te nekarî bêji ka awêneyek bidin ber rûyê min lê tu karîbûyayî ji te yê ji şerman negota, tu wek miriyan bûy û te awêne dixwest, meraqa çav û birûyan, lêv û pozî dikir.

Dê wiha bigotana. Loma ji te di çend kêliyên bêmecal lê şiyar de ev daxwaza xwe, wek qaşilê gûzê daqurtand. Çi bû, çima te dixwest di wê rewşê de ji xwe bibîni? Qey xwenditî, xerîbî û tenêti bû li çolan? Paşê ji kêfa te hat. Ji dêvla kêfa awêneyê, kêfa te hat ku way tu dixwazî wê bibîni? Wê bibîni yan ji rûyê xwe? 'Her duyan ji' ne? Lê disa ji lêgerîna li awêneyê ji û mayîna bê wê ji xweş bû di wan rojên nexweş ên li nav zivistanek zor û pêxas de.

*Zivîstana pêxas nexweş bû di canê te de
Ne li ser hemdê xwe ne bê hemdê xwe
Xwe digevizand di nav toz û tubarê de
Her tişt dipêpîtî dema ew dipêpîtî
Ji wan rojên zêr û zemberî û bêbêvî
Ka tu li ku yî ka?
Wekî pepûkekê wiha dixwend te
Li ser kavilên her tiştî
Te ji kê re digot, ji kê dipirsî
Tu li ser kê dinaliyayî kesê nedîzanî
Ka tu li ku yî ka? Kî bû ew kî bû?
Pepûkî çima evqas bi van gotinan li bejna te
hatibû?*

*Bi çavên bêkêf li kê digeriya
Min li bin çavên xerîbîyê bi tenê nebêle
Wîba bi ser min de neyê ey xerîbî
zivîstana pêxas ez nexweş im.*



Zehra Mohammedzadeh

Şikestina zimên!

Ziman yek ji hêmayê herî mênawî ya civak û gelan e. Civak çawa xwe li dora nîrxên çandî saz dike, ziman ji parçeyek ji wê çandê ye ku civakê li ser pêyan digire. A rast mirov dikare zimên wek çandê bixwe ji binirxîne. Ger em zimên tenê wek navgîna hevfermîkirinê bibînin, em ê şaşiyê bikin. Ji ber ku ziman hafîzeyê, hafîzeyek ku civakê li ser lîngan digire.

Ziman ruh e! Ger ziman tune be, ruh ji tîkê diçe û mirov bê kok dimîne. Dema ziman tune be, dîrok, civak û hemû nîrxên ku wê civakê pêk tînin ji tune dibin.

Li rojhilatê Kurdistanê îro zimane kurdî bi asimilasyonê cidî re rû bi rû ye. Helbet di gelek serdemên cuda de, ji dema Şah Îsmail bigirin heya Şah Riza Pehlevî kurd her tim rastî polîtîkayên asimilasyonê hatine. Nexasim kurdên di navbera dewletên osmanî û şahên Îranê de her tim rastî koça bi darê zorê dihatin, di nav kom, an ji civakên cihê de dihatin bicîhkirin û ev yek ji bi demê re li guherîn û tunebûna zimane wan ê dayikê vedikir. Bi taybetî guhertînan êrdnîgarî di tunebûna zimên de roleke xwe ya diyarker heye.

Bêguman polîtîkayên asimilasyonê di dema Komara Îslamî ya

Îranê de ji berdewam dike. Carcaranê hişk, gelek caran ji bi polîtîkayên zirav ev yek tê birêvebirin.

Ger em îro lê binêrin, em ê bandora zimane farisî ya li ser zimane kurdî hîn zelaltir bibînin. Çi zaravayê soranî, çi ji kurmançî (zaravayên kurdî yên din ji di nav de), her du zarava ji rastî şikestinê hatine. Ziman dema rastî şikestinê hat, wê demê gelek tişt jixwe kêm dike. Vedîgûhere tişteke din. Zimane kurdî bi tîra xwe dewlemend e. Lê em di salên dawî de li şûna peyvên kurdî hîn zêdetir rastî peyvên farisî tînin.

Mînak, li şûna peyva 'meşînrêveçûn'ê 'piyadê rewî', li şûna peyva 'birsîme-birçîme'yê 'gorusnemê', li şûna peyva 'duh û îro' ji 'dîroz-emroz', dîsa reng ne bi kurdî bi zimane farisî tînin destnîşankirin. Bêguman ev tenê hîn mînak bûn û bi dehan mînakên wiha hene. Gelo çiqas haya me ji wê yekê heye? Yan ji em ji xwe serdemên wê yekê dipirsin! Ji ber ku ziman li ser zihniyet û tevgera me tesîreke rasterast çêdike.

Bi şoreşa komara îslamî re rêbazekê nû ji asimilasyonê re tê dîtin. Heya wê demê bi gelemperî dayikên kurd li derveyî zimane xwe tu zimane din nedizanin.

Ger berhemên nivîskî tune bin ji, em ji wan hay ji çîrok, serpêhatî û destanên kurdan dibûn. Ev çîrok û destan ji bi zimane kurdî yê herî resen tanîn ziman û ji nîfşekê vedîgûhestin nîfşekê din.

Di bin navê "Em Îranê bikin dibistan", di 28'ê çîleya 1979'an de, salek piştî şoreşa îslamî û bi destê Ruhullah Xomîynî, dibistanên şevê yê bi navê "Nehzet Sevad Amozî" tînin damezrandin. Ev dibistan roleke diyarker di asimilasyonê de dilîzin. Navên kurdî tînin qedexekirin û her çend zimane jiyane yê kurdan kurdî be ji, bi demê re ziman bi xeteriyek cidî re rû bi rû dibe. Ji ber ku her diçû di kurdî de şikestin çêdibû, peyvên nû şûna peyvên kurdî digirtin.

Jixwe zimane kurdî di nav çanda gundewar de hîn baştir xwe parastibû û hîn mirov nedikarî behsa şikestin û guherîna di zimên de bike. Lê koçberiya ji ber şer, aborî û hwd. dîsa jiyana bajarvanî bandoreke neyînî wê li zimên bikira. Nexasim ji pêvajoya piştî şoreşa îslamî. Ji ber vê çendê, gerek em nebêjin li Rojhilat zimane kurdî ne di xeteriyê de ye. Îro hema bêje li her çar perçeyên Kurdistanê heman xetere li ser zimane kurdî heye.

Li Meşhedê di navbera salên 1981-1985'an de xwendekarên zanîngeha Ferdowsî dest bi xebata xwendin û fêrkirina zimane dayikê dîkin. Her wiha di radyoya Meşhedê de ku rojê saetekê weşana bi zimane kurdî dikir, gelek dengbêj û stranbêjên kurd stran gotîne. Disa li Xorasanê kêm be ji gelek xebatên wêjeyî û ziman hatîye kirin. Li Urmiyeyê di sala 2003'yan de, bi saya komek rewşenbîr û çalakvanên çand û hunerê, destûra vekirina navenda Ehmedê Xanî ji wezaretê te wergirtin lê di demeke kin de rastî zext û zordariya dewletê tê. Bi taybetî piştî çapa kovara "Çand" a sala 2013'yan (1390), kovar yekser hat qedexekirin û di sala 2014'an de deriyê navendê te mohrkirin.

Di navbera salên 1997-2005'an heya rêjeyekê xebatên ziman û wêjeyê hatîbin kirin ji, piştî 2005'an zexta li ser xebatên ji bo ziman her ku çû zêdetir bû.

Ziman weke rêyêke di navbera hafîze û hebûnê de ye. Dema ev rê bê qutkirin an ji bê guhertin, wê demê dişikê û ber bi cihêkî din ve diçe. Lewma ji îro pêwîstiya kurdan ji av û nan zêdetir bi perwerdeya zimane dayikê heye. Hewceya her keli û jiyana me bi kurdî be, ji ber ku ger em pêşiya wê şikestina di zimên de negirin, her ku biçe wê mezintir bibe. Ger em dixwazin di wê sedsalê de "Hebûn" a xwe biparêzin, wê demê hewce ye em di mijara zimên de serferber bin.

Di rojên koronayê de darbeya siyasî

Dewleta tirk bi tayînkirina qeyûman ve 8 şaredariyên din ên HDP'î desteser kirin. Hemû cihan li hemberî koronayê têdikoşe û dewleta tirk jî şerê destkeftiyên kurdan dike

Navenda Nûçeyan

Hikûmeta AKP'ê ku di her şert û mercî de şerê kurdan dike, operasyona xwe ya ku di 3'yê tebaxa 2019'an de li dijî şaredariyên HDP'ê dabû destpêkirin, heftaya borî jî berdewam kir. Di van rojên ku herkes ji ber vîrûsa koronayê ketiye derdê canê xwe, AKP'ê 8 şaredariyên din ên kurdan desteser kir.

Di vê çarçoveyê de di 23'yê adarê de vîna gelê kurd tune hat hesabandin û Şaredariya Êlihê, şaredariyên Farqîn, Erxenî, Gêlê û Licê yên Amedê, şaredariya Norşîn a Bêdlîsê, şaredariya bajaroka Xelfelî ya Îdirê û şaredariya bajaroka Cîwanîk a Sêrtê hatin desteserkirin.

Şaredarî dorpêç kirin

Şaredariyên navborî di serê sibehê de ji ewil ji hêla hejmareke zêde ya polîsan ve hatin dorpêçkirin. Pişt re jî polîsan bi ser malên hevşaredaran de girt û hevşaredar binçav kirin. Wezareta karên hundir di saetên ber bi



'Tekane rêya xelasîyê pergala hevserokatîyê ye'

Hevşaredarên Êlihê Mehmet Demîr û Songul Korkmaz piştî ku hatin berdan, têkildarî binçavkirina xwe axivîn. Hevşaredaran diyar kir ku bi awayeke kelemçekîrî derxistine pêşberî dozger û rûyê dozger negirtiye ku li

rûyê wan binêre. Hevşaredaran da zanîn ku xebat û bernamayan wan ên di dema hîlbijartinê de ji wan hatiye pirsîn. Hevşaredaran got ku pergala hevserokatîyê ji wan hatiye pirsîn û dozger pergala hevserokatîyê

weke sûc pênase kiriye. Hevşaredaran got, "Li dijî zîhnîyeta DAIŞ'ê, tekane rêya xelasîyê, pergala hevserokatîyê ye. Em ê heta dawîyê biparêzin. Dê ev şert û merc ji holê rabin û em ê careke din bi ser bikevin."

êvarê ya heman rojê de li şûna hevşaredarên HDP'î, qeyûm tayîn kirin.

Wezarete li şûna hevşaredarên Êlihê Mehmet Demîr û Songul Korkmaz, waliyê Êlihê, ji bo şaredariyên Farqîn, Erxenî, Gêlê, Licê, Norşîn, Xelfelî û Cîwanîkayê jî qaymeqamên van navçeyan weke qeyûm tayîn kirin.

Tunehesibandina vîna gel

Ji bilî hevşaredarê Gêlê Mustafa Akkul, hemû hevşaredar rojek piştî binçavkirinê hatin berdan. Hevşaredara Farqînê Naşide Toprak û hevşaredarê Licê Tarik Mercan jî bi şertê hefsa malê û qedexeya derketina derveyî welat hatin berdan. Hevşaredarên din jî bi şertê kontrola edlî û qedexeya derketina derve hatin berdan.

Tayînkirina qeyûman di serî de HDP, ji hêla gelek derdorên cuda ve hate şermezarkirin. Hevserokên HDP'ê Pervîn Bûldan û Mîthath Sancar û parlamenterên HDP'ê tayînkirina qeyûman weke "Tunehesibandina vîna gelê kurd" nixandî. HDP'yan got ku bi tayînkirina qeyûman re dijminahiya li hemberî kurdan di rojên vîrûsa koronayê de jî hatiye berdewamkirin.

'Em ê serê xwe netewînin'

Parlamenterên HDP'ê jî di Lijneya Giştî ya Meclîsê de bi awayekî tund li dijî tayînkirina qeyûman a ser şaredariyên xwe derketin. Parlamenteran ji rayedarên AKP'ê re gotin ku di dijminahiya li dijî kurdan de şînoran nas nakin û di hemû şert û mercan de AKP dijminahiya xwe ya li dijî kurdan didomîne. HDP'yan destnîşan kir ku dê tu carî serê xwe li ber polîtîkayên AKP'ê yê dijminane netewînin û li gel hemû astengiyên jî dê siyasete bikin.

Tevî ku vîrûsa koronayê li ser jiyana hemû mirovahiyê xetereyeke mezin e, gelê kurd ên li bajar û navçeyên ku qeyûm lê hatine tayînkirin, daket kolanan û tayînkirina qeyûman şermezar kir. Bi taybetî di saetên şevê de gel bi çalakiyên deng derxistinê, li dijî tayînkirina qeyûman derket û bertek nîşanî polîtîkayên AKP'ê yê li dijî vîna xwe dan.

Banga yekhelwestiyê

Tayînkirina qeyûman ji hêla gelek derdorên cuda ve jî hate şermezarkirin. Di serî de CHP, CHP piraniya partiyên çepgir ên Tirkiyeyê jî ber tayînkirina qeyû-

man, bi awayekî tund hikûmeta AKP'ê rexne kirin. Partiyên tayînkirina qeyûman weke 'darbeyeye siyasî' penase kirin û li dijî polîtîkayên AKP'ê banga avakirina eniyeye hevpar kirin. Li dijî AKP'ê banga helwesta hevpar li hemû derdorên demokrat hate kirin.

Lê belê balkêşe ku tevî gelek bertek û çalakiyan jî, hikûmeta AKP'ê heta niha jî têkildarî tayînkirina qeyûman de tu daxuyanî nedane.

Şaredariyên HDP'ê

Bi tayînkirina qeyûman a li ser 8 şaredariyên dawîn re, hejmara şaredariyên HDP'ê yê ku hatine desteserkirin bû 40. Bi vê yekê re jî 65 şaredariyan tene 18 şaredarî di destê HDP'ê de man. Şaredariyên ku di destê HDP'ê de mane wiha ne: "Komîr a Semsûrê, Bazîd, Panos û Giyadîn ên Agiriyê, Hezo ya Êlihê, Pîran û Çinar ên Amedê, bajaroka Sarican a Xarpêtê, Qereçoban a Erzîromê, Îdir, bajaroka Hoşhaber a Îdirê, Qers, bajaroka Vartînîs a Mûşê, Sêrt û navçeyên wê Xana Hewêl û Misircê, Silopiya ya Şîrnexê û bajaroka Gundikê Melê ya Şîrnexê.

Xweşkanî

Felemez Ulug



Bendewarî û hêza civakî

Di rojên vîrûsê de rewşa Kurdistanê bi xetereyên pir mezin re rû bi rû ye. Dewleta tirk di van rojên wisa bi eş de jî di dijminatîya kurdan de bi îsrar e. Ji bo gelê kurd di vê demê de hîn pirtir eş bîkşîne û muxtacı van bibe serî li hemû rêyên qirêj didin.

Gelên li bakurê Kurdistanê baş dizanin ku şaredariyên HDP'ê ji bo tendurîstiya gel biparêzin bi hemû derfetên xwe ve di nava hewldanan de ne. Ji ber ku ev şaredarî, beriya her tiştî girîngiyê didin nîrxên mirovahiyê. Lewma jî bo wan a girîng ew e ku beyî cudahiye bixin navbera din, ziman û neteweyan, destê alikariyê dirêjî her kesî dikin. Ji bo di vê dema wiha bi zehmet û bi eş de ev şaredariyên HDP'ê erka xwe bi cih neyînin û di çavê gel de nîrxên wan bikevin, desthilatdariya tirk weke her carê ketin nava listikên qirêjî.

Li gorî agahiyên ji navêndên tendurîstîyan, dewleta tirk heya niha li bajarên bakurê Kurdistanê jî bo pêşilêgirtina belavbûna vîrûsê tu xebat nedane meşandin. Li ruxmî vê, nahêla şaredariyên HDP'ê jî alikariyê bidin gel.

Di roja me ya îroyîn de çî dibê bila bibe yekem rojê cihanê, vîrûsa koronayê ye. Lê mixabin di van rojên wisa bi eş de jî dewleta tirk tendurîstiya gel danîye aliyekî û di polîtîkayên xwe yê înkare de îsrar dike. Mînaka vê ya herî berbiçav jî desteserkirina şaredariya Êlihê û 7 şaredariyên din ên HDP'ê ne.

Mixabin dewleta tirk qîma xwe bi vî jî neanî û li hin deverên bakurê Kurdistanê wek herêmên nû yê operasyonên leşkerî ragihand û dest bi operasyonên leşkerî kir.

Di vê rewşê de pêwîste tu kurd nekeve nav bendewariyên şaş. Ji destê AKP dê alîkarî tu carê neyê herêmê. Her çiqas rewşê cuda û pêwîstî bi nîrxên mirovahiyê hebe jî, ji bo dewleta tirk û bi taybet jî ji bo AKP'ê dema mijar dibê gelê kurd, mijar tê guhertin. Lewma li herêma bakurê Kurdistanê pêwîste kes ne li bendê be ku dewleta tirk ji wan re bibe alîkar û wan ji van rojên zehmet xelas bike.

Di vê demê de pêwîste gelê kurd neyarê xwe baş bibîne û baş nas bike. Her wiha di van rojên wisa bi zehmet de berpirsariyê erka HDP'ê jî pir girîng e. Di vê demê de pêwîste HDP bîyî ku ji dewleta bixwaze û bikeve nava bendewariyê, divê bi hêza xwe ya civakî xwedî li gelên herêmê derkeve. Ev roj rojên giran in. Di van rojan de pêwîstî bi gelek tiştan çêdibe lê derfetên HDP'ê jî li ber çavanin û tîna zanîn. Lê çî dibê bila bibê pêwîste HDP li dijî van operasyonên desteserkirina şaredariyan, xwe teslimî van şert û mercên zehmet neke. Ev rewş jî bo HDP'ê jî ezmuneke girîng e.

Tayînkirina qeyûman şibandin vîrûsê

Şaxa Komeleya Mafên Mirovan (İHD) a Amedê û Platforma Ked û Demokrasiyê ya Amedê (EMEP) jî têkildarî tayînkirina qeyûman daxuyanî dan.

İHD'ê di daxuyanîyê de diyar kir ku tayînkirina qeyûman, tunehesibandina vîna gel û paşguhkirina tendurîstiya gel e. İHD'ê destnîşan kir ku tayînkirina qeyûman darbeyeke li dijî bergiriyên vîrûsê ye.

Platforma Ked û Demokrasiyê jî tayînkirina qeyûman weke 'vîrûs' ê pênase kir û got; "Bi tayînkirina qeyûman vîrûsê digihînin demokratîkbûna Tirkiyeyê." Platformê herî dawî jî bang li hikûmeta AKP'ê kir ku êdî dev ji dijminatîya kurdan berdin.



Xebata Tifaqa kurdistanî qeyûm nas nekir

Xebata Tifaqa Kurdistanî bi daxuyanîyêke nivîskî bertek nîşanî tayînkirina qeyûman da. Tifaqê diyar kir ku desthilata AKP'ê li dijî kurdan pêngaveke din daye destpêkirin û tayînkirina qeyûman şermezar kir. Tifaqê bal ki-

şand ser dema tayînkirina qeyûman û destnîşan kir ku bi tayînkirina qeyûman re derbe li xebatên şaredariyan ên ji bo parastina ji vîrûsa koronayê hatiye xistin. Bi domdarî jî tifaqê ev tişt parve kirin: "Em vî zilmê qebûl nakin.

Em bang li gelê xwe dikin xwedî li hîlbijartiyên xwe derkevin. Em bang li AKP'ê dikin ku hîlbijartiyên gelê kurd ên bi rêyên sîvil û demokratîk hatin hîlbijartin, qebûl bikin. Dev ji dijminatîya li hemberî hîlbijartiyên kurd berdin."



LI GIYANÊ DÊ Û BAPÎRÊN XWE XWEDÎ DERKEVIN

Helbestkar nikare dûrî êşa welatê xwe bijî

→ Rizoyê Xerzî

Rojava pênaseya min û bûneweriya min a herî zelal û berdest e. Rojava wek xewn, wek giyan, wek ax û wek azmûneke giyanî diparêzim. Pêwîst e ez jî kêlikên xweşik zeft bikim û di dîrokê de biçesipînim her wiha wijdanê xwe di astên herî rehagir de bi kar bînim.

Ehmedê Huseynî kî ye?



Helbestvanê kurd Ehmedê Huseynî di sala 1955'an de li bajarê Amûdê yê Rojavayê Kurdistanê hatiye dinyayê. Di sala 1983'an de beşa felsefeyê li zanîngeha Şamê xwendiyê û bidawî kiriyê. Di sala 1989'an de koçî Swêdê bûye. Dîwana wî ya ku berhemên wî yê giştî dihewîne di sala 2001'ê de ji alî weşanxaneyê Avestayê ve hate çapkirin. Huseynî piştî Swêdê li Londonê biçih bû û di van salên dawî de vegeyariyê Rojavayê Kurdistanê û li wir dijî.

Xwînerên hêja, vê hejmarê me berê xwe da bajarê evîne û em bûn mêvanê xewletgeha şêxê helbestê Ehmedê Huseynî û der barê jiyana, helbest, xewn û êşên xwe de, me ev hevpeyvîn kir. Fermo em bi hev re li bersivên helbestkarê xwe binêrin.

Mamoste ji kerema xwe tu dikarî ji xwendevanên Xwebûnê re hinekî behsa Ehmedê din bikî, yanî ne Ehmedê helbestvan, ne yê pêşkêşvan ji derveyê helbestê Ehmedê Huseynî kî ye?

Êvarek ji êvarên payîza Amûdê bû, li Beriya Mêrdîne kaviyên xweliyê ji dayik dibûn, peyamên pêxemberan li ser lêvên dûmanê zuha dibûn, ewrên reş bi ser bişkojên xewnê de diketin, dengbêjan dest ji çîrokên sînor û mayinan berdidan û dayika min jî li ber tîna agirê Sînemeya Amûdê dest bi afirandina sirûdên êş û dest bi ristina lavijên şîngirî û reşgirêdanê dikir.

Zarokê pînc salî di şûna spî de hînî reş dibe, di şûna rojê de hînî şevê dibe, di şûna ken de hînî girî dibe, di şûna hembêzkirinê de hînî xatirxwestinê dibe û di şûna ku raz û wateyên berbangê bixwîne, surdarî û nepeniyên keskesorê rave bike, sersomî û dilmestiya tavsorkê zeft bike, di şûna wê de, goristanan dihejmêre, bêdengiya kêlan di şaneyên xwe de dadiçikîne û ji mirinekê ber bi mirineke din ve, dayika xwe li ser milên xwe hildigire, ji Efrînê ber bi Serêkaniyê ve, ji Kobanêyê ber bi Qamişloke ve, ji goristanekê ber bi ya din ve dibeze, dilerize, dişikê, dinale û di dawî de di sînga qedera xwe de hetahetayê radize.

Kî me nizanîm? Lê ji şewata Amûdê hetanî bi şewatên Rojava baş dizanîm ku guliyek ji guliyên êgir im, ku peyveke êşbar di ferhenga jiyandê de, ku straneke ji komerê di bîra dîrokê de, ku nexşeyeke lanetê di stûyê mirovatîyê de me.

Li gorî gelek kesan zimanê ku tu pê helbesta xwe dinivîstî gelekî zehmet e û asta zanîna gelê me ku bi zimanê xwe perwerde nebûye aşkera ye, tu vê yekê çawa şrove dikî?

Dema ku ez helbestvanekî rastexwîn e bîm, dema ku ez xemxur û şagirdê Melayê Cizîrî bîm, dema ku ez rola xwe ya rastîn wek helbestvanê miletekî bindest, dema ku bizanibim ku zimanê min talan dibe, bînpê dibe, pêwîst e li koşeyên tarî, li derbirînên ku nayên derbirîn, li gencîneyên veşartî, li hêza ku di şaneyên zimên de veşartî, li bûneweriya zimanê xwe bigerin.

Rola min ew e ku zimanê xwe di derbirînê de bigihînim asta herî dawîn, ku xeyalê ji bandore zimanê dagîrkeran rizgar bikim, ku hestên xwe bi ava zelal û pîroz a Melayê Cizîrî bişom, ku xeyala xwe bi Şakiro, Mihemed Arif û Fadilê Cizîrê ji nû ve ava bikim ku şerê zimanê serdestê xwe di hinavên xwe de bikim, ku wekû kurdekî li xwe, li derûdora xwe, li mirovatîyê binêrim û ji maka Kurdî werim zimanê hişmendî, hişyarî û zanîna xwe.

Ez bi Kurdî dinivîstînim, hewl



didim ku ew Kurdî bersiva giyanê min, êşa min, bîra min, derd û kul û evîna min be.

Nivîskarê Kurd Mehmedê Lewendî berî 20 salan ev çîrok ji min re got.

“Min helbesteke te wergerand Turkî, li civatekî min helbesta te bi turkî xwend, min ji wan re negot a kê ye? Ne jî min got ku werger e. Ji min re gotin ku helbesteke pir xweş e yaho, ma ya kê ye? Min bersiva wan da û got: min ew ji kurdî wergerandiye turkî, helbesta Ehmedê Huseynî ye. Hela hela ma tiştên wisa xweş bi kurdî jî tînin nivîsandin?”

Bawer im ev dîmen tîra gelek bersivan dîke.

Ez ê careke din ji bibêjim: di dîroka tîkoşîna Kurdan a ji bo azadiyê de, zimanê Kurdî mezintirîn şehidê wê tîkoşînê ye!!

Di demekê de ku koçberiya xelkên Rojava ber bi Ewropa û welatên din ve dest pê kiribû, te koçberiyek berevajî kir tu ji welatekî dûr vegeyariya û li Rojava biçih bû, sedema vê yekê çi bû, tu dikarî hinekî vê mijarê zelal bikî?

Ezê li vir tiştêkî bibêjim: Li Rojavayê, xaniyekî min tune ye, bi qasî du buhust erdê min jî tune ye, di xaniyekî bi kirê de me, lê pêwîst e bibêjim ku, ev Rojava hebûna min e, xewna min e, êş û şewata min e ya ku ji Sînemeya Amûdê dest pê dîke û bi şehadeta Seyfo, Yûsiv, Tolhildan, Goran, Şaho, Hevrîn, Şiwêş, Lewend, Seydo bi dawî nabe.

Tiştêkî pir seyr û balkêş e, çawan helbestvanek, dema ku derfet hebe, dikare dûrî êşa welatê xwe bijî? Çawan dikare ji paş deryayan li wê êşê temaşa bike, wê êşê derbibire bêyî ku di naveroka wê êşê de bijî?

Min gelek pîrs ji xwe kirin, min 25 salên penaberiyê li ber çavên xwe raxistin û min ji xwe jî pîrsî: tu çawan di van kêlikên dijwar ên Rojava de, dikarî helbestvanekî rastexwînê bî bêyî ku tu li teniştê xelkên xwe bî, bêyî ku tu nav di şervanên xwe bidî, bêyî ku tu bi destê ketiyên bigirî û qehremanan himbêz bikî?

Min hewl da bi xwe re, bi zaroktiya xwe re, bi kolanên bajarê xwe re, bi bîranîn xwe re, bi goristan û bîna

dayika xwe re rast û durist bîm.

Sere 40 salan der barê azadiyê dinivîsim, êdî çawan derfeta ku di azadiyê de bijîm hebe û ji destê xwe berdim?

Bi kurtî, temenê min ê rastîn ne 65 sal in, bi tenê çar sal in, çar salên ku li Rojava dijîm û di evîna Rojava de dihelim.

Di van salên dawî de û bi taybetî piştî biçihbûna li Rojava, bi qasî ez dişopînim hema bêje hemû helbestên te nivîsandine bi sernavê ‘destên te’ dest pê dîke, tu dikarî hinekî behsa wê projeyê bikî?

Ji bo yî ku kêlikên watedar û pîroz ên Rojavayê ji dest xwe ber nedim, ji bo yî ku bikaribim peyama xwe ya mirovane ragihînim û çêjekê pêşkêşî jiyana xwe û jiyana derûdora xwe bikim, pêwîst e bi dijwarî li dijî sextekar û derewîn û keysperestan rawestim, pêre pêre jî dilsojan, kedkaran, qehremanan, xweşmêr û xweşjin û destpakên ku Rojava wek xewn, wek giyan, wek ax û wek ezmûneke jiyandî diparêzin, pêwîst e ez jî kêlikên xweşik zeft bikim û di dîrokê de biçesipînim û wijdanê xwe di astên herî rehagir de bi kar bînim.

Li hemberî destên wêranker, destine din hene ku şev û rojê li çemk û têgeh û li nexşeyên eşqa Rojava digerin û di kêlikên herî tirsak de, rûyê mirovane û spehî, dilê tijî hezkirinê Rojava diafirînin.

Destên ku derberê wan dinivîstînim, ew dest in ku dest ji axê bernadin. Ew dest in ku xatir ji Rojava naxwazin, ew dest in ku Rojava di kûrahiya şaneyên xwe de vedişêrin û bêyî jena dilê Rojava nikarin behsa tîpan, rengan, derbirînan, dahênan û afirandinê bikin.

Tê bîra min beriya 9-10 salan bû ku bi salan te Rojava nedîtibû, em bi hev re çûn nêzî sînor û ji aliyê din ê sînor te li Amûdê mêze kir û gelekî giriya, niha tu di bin baskê Amûdê de dijî, tu çawa dikarî behsa hestên xwe yên wê demê û niha bikî?

Belê rast e.. Çunkî her gav, li welatên penaberiyê, tiştêkî bîra min de bû: “ez ê di tabûtê de vegeyirî Amûdê” yanî vegeyirî li Amûdê bi tenê mirin bû. Di wan kêlikan de bi

hezaran bîranîn wek kêran dihatin û di hestên min de diteqiyên. Zarotî, dost û heval, toza kolanan, evîna pêşîn, maça pêşîn, şkestin, tîkçûn, xewn û hêvî, çol û heriya zivistanê, darê mamosteyan, nasnameya birîndar û zimanê qedexê, hemû bi hev re dihatin û wekû sîmirxekî di xeyala min de divejiyan, êdî ji bilî girî tu çareyeke din tune bû da ku dilê xwe û dilê qedera xwe hênik bikim.

Niha di jiyana li Rojava de tiştê herî zêde kêfa te tîne û yê herî zêde te xemgîn dîke çi ye?

Di hemû movikên dîrokê de, di hemû traedyayên mezin ên mirovatîyê de, ji dema Homîros de, ji dema ku Ilyaza û Odêsa nivîsand “Iliad û Odyssey” û hetanî vê kêlikê, bi qasî ku qehremanên miletan hene ewqasî bazirgan û firoşkerên xwînê hene, ev nakokî, ev hev kêş bi dawî nabe. Wisa jî li Rojava, lê pêwîst e wek helbestvanekî Kurd bibêjim: ku ev Rojava ya min e, şehidên Rojava keç û kurên min in, serkeftina Rojava û tîkçûna Rojava serkeftin û tîkçûna min e. Ji derveyê siyaset û idyolojîyayê, ji derveyê hesabên biçûk û demikî, Rojava pênaseya min û bûneweriya min a herî zelal û berdest e.

Tiştê ku dixwazim bibêjim ev e: li Rojava tiştêkî mirov xemgîn bike yan jî kêfxweş bike tune, li Rojava bi tenê hinaseyek heye ew jî hinaseya ku bi dawî nabe ya azadiyê ye.

Ez di wê hinaseyê de dijîm, di wê hinaseyê de jiyandê berdewam dikim, di wê hinaseyê de dixwazim helbestê, evîne, dilsojiyê û gerdûnê jî agahdarî evîna xwe bikim..

Ez yek ji aşiqên herî dilsoj ên Rojava me. Lewra jî hemû hêzên reş êrîşî vê eşqa min dikin, çunkî dizanin ku eşqa min ji dil û hinavên min e..

Hêvî û daxwazên te, pêşniyar û şîretên te bo nivîskar û rewşên bîrên kurd çi ne?

Di serî de, rihê xwe, hestên xwe, şaneyên xwe, xeyala xwe, hişmendî û hişyarî û helwesta xwe, DNAYA xwe ji şopa zimanê serdestê xwe bişon, bi kurdî hest bikin, bi kurdî li xwe û li cihanê binêrin û bi kurdî xwe û xewna xwe û êş û birînen xwe bibêjin. Piçêkî hevûdû bipejirînin, piçêkî li hevûdû guhdarî bikin, piçêkî di bazinê şaristanî û paşxaneyê Mezopotamyayê tev bigerin, piçêkî li hemberî Turkî, Erebi, Farisî xwe kêm nebînin, piçêkî li giyanê dê û bapîrên xwe xwedî derkevin û dema ku dîmena rewşên bîriya kurdî nîgar bikin, bila ji rih û can bi xwe re dilsoj bin.

Dawî ji em çawa xatirê xwe ji xwendevanên rojnameyê bixwazin, gelo dibe em bi helbestekê xatir bixwazin, helbesteke ku te di dema dawî de nivîsandibe?

Bi tenê dixwazim ji Amedê re, ji Karwan Sarayê re, ji Deriyê Çiyê re, ji Deriyê Mêrdîne re û ji deriyê Ruhayê re bibêjim: Va em komara dilê xwe di dilê xwe de ava dikim, va em li vê Rojavayê dilekî nû ji we re diafirînin, dilekî bi qasî bejna êşê, bi qasî bejna xwîna pîroz û dilekî bi qasî bejna evîna min.



Xalê Misto

Mem Farqînî

Temenê xalê Misto digihîşt şestî. Di vî temenê xwe yê dirêj de gelek zor û zehmetî û xizaniyê dîtibû. Her xêzeka li ser çavên wî berxwedana wî ya li dijî şert û mercên jiyana xedar, têkoşîna wî ya di nav êş û elemê de dida xuyakirin.

Xalê Misto li gorî xwe zilamekî bêhnfireh bû. Carcaran li dijî tevgerên zarokan bêhna wî teng bibe ji tu caran wan nedîşand. Zarokan jî, gundiyan jî ev tişt dizanibû. Him pir zû hêrs dibû, him jî zû dihat ser hemdê xwe. Loma serê wî di aliyê zarokan de tim di tengasiyê de bû.

Zarokên gund carna ji bo wî bi-qeherînin gava li pey hêstira xwe diçû nav zeviya bi pey diketin. Û bi yek dengî heta ku ji wan dihat diqêriyan.

“Xalê Misto
Doxîn sisto
Ji kerê keto
Xwedê lêxisto!..”

Bi vî qêrîna wan xwedêgiravî ew jî hêrs dibû û xwe dixeyidand. Lê mesela wî ya hêrsbûnê ne ev gotin bûn. Gava zarok digiriyan hêstira wî ditirsiya û hêstirê dest bi zîtikan dikir. Heta xalê Misto dîsa hêstira xwe zêft dikir gelek zahmetî dikîşand. Di nav xwedanê de dima. Diwestiya û xalê Misto dest bi çêran dikir. Çi dihat ber devê wî digot. Tu kes, tu tişt ji çêrên devê wî derdiketin xelas nedibû. Çav li wî sor dibûn. Ew çî qas dengê xwe bilind bikirina û çêra bikirina zarokan jî ew çî qêrîna xwe bilind dikir û ji pey wî nediqetiyên. Xalê Misto jî dev ji çêrên xwe bernedida. Evana tev ên ku ji derve dihatin xuyakirin bûn.

Lê meseleya xwe ya sereke tenê ew dizanibû. Hêrsbûna wî ne li dijî zarokan bû. Ne jî ji ber dînbûna hêstira wî bû. Ew bi van çêran li hember zilm û zehmetiya jiyana serî hildida. Lê çî bike belengazo. Temen her diçû mezin dibû. Her tiştî wenda kiribû û tenê çêr di destan de mabûn.

Gava dengê kenên zarokan dihatin guhên wî, serê xwe dihejand. Bi her du aliyan yek bi yek çêr rêz dikirin. Û diket pey hêstira xwe ya tirsîyayî. Dimeşîya û diçû.

Di sa rojek wisa bû. Dema xalê

Misto li pey hêstira xwe ketibû rê. Diçû nav zeviya xwe. Tişteke ecêb qewimibû. Îroj zarok nehatibûn ser rêya wî, matmayî mabû. Li rexmî vêya bi dilekî aram gihîşt zeviya xwe. Dest bi karê xwe kir. Li ber destê esrê karê xwe xelas kir û hêdî hêdî ber bi gund ve bi rê ket.

Gava gihîşt qada gund dît ku zarokên çûbûn ber pez ji hêdî hêdî ber bi gund ve dihatin. Qet li wir nesekînî. Hêstira xwe bir malê. Barê xwe danî xwarê. Û hefsarê hêstirê da destê keçîka xwe ya biçûk Solînê. Ji wê re got, hêstirê bibe ser çem av bide. Gava Solîna biçûk hefsarê hêstirê girt û ber bi çem ve bi rê ket, xalê Misto jî ji qutiya xwe çixarekê pêça û ber bi qada gund ve çû. Gava gihîşt wê derê dît ku sivan jî waye hêdî hêdî dikevin wan gund. Ber bi malên xwe ve diçûn.

Dem a gihîşt qada gund dît ku çend hevalên xalê Misto beriya wî hatine wir. Di nav xwe de xeber didin. Ber bi wan ve çû. Dem a gihîşt ba wan silavê dan hev û din. Û ji bo fêhm bike ka li ser çî nîqaş dikin mijar çî ye, xebardan guhdar kirin. Nîqaşên rojane yê gundiyan bûn. Gava çavên wî bi kurê wî Salih ket hê gotinek jî ji devê wî derneketibû.

Salih pezê xwe dabû ber xwe û ji alikî de wan ber bi malê ve dibir û ji aliyê din ve jî digiriya. Hêsiyên ji çavan dirijiyên, lîka ji poz hatibû xwarê û gilêza devê wî tev gihîştibûn hev ser çavên wî.

Gava xalê Misto dît ku Salih digirî gazî wî kir û xwest hîn bibe ka ji bo çî digirî. Salih ji alikî de digiriya ji alikî de jî bi tirs got ku wî pezeke xwe wenda kiriyê. Îske îska wî hevok di qirika wî de hiştibû.

Nivro gava tav li asîmanê şin derketibû ciyê xwe yê herî jor, wî jî pezê xwe dabû ber xwe û ew biribûn bin siya darekê rûniştibû û wan kiribû mexel. Piştî viya jî li bin siya darê nan û pîvaza di tûrikê xwe de derxistibû û xwaribû. Piştî xwarina xwe xwaribû giranîkî hatibû ser wî. Xwe di bin siya darê de dirêj kiribû. Di vî kelagerma rojê de ev siya darê jî wî re wek bihûşt hatibû. Bi dilrihetî xwe dirêj kiribû. Piştî demeke kin di xewê re çûbû.

Gava ji xew şiyar bû qederek çavên xwe venekir. Bayekî hênîk dihat û wî jî bi kêfxweşî her du des-

tên xwe bir bin serê xwe. Demekê wiha li ser piştê sekinî.

Di dawîya dawî de te digot qey tişteke hatiye bîra wî ji nişka ve rabû ser xwe. Bi wan çavên xewî li der û dora xwe mêze kir.

Pez ji mexel rabibû û li der dora wî diqêriyan. Jixwe tevî hev şes heb bûn. Ji ber ku nû ji xewê şiyar bûbû hişê wî bi tevahî ne li ser pez bû. Loma bi baldarî li der dora xwe mêze nekir. Piştî qederek gava ji bo pez rabû ser xwe û ber bi wan ve çû hê nû ferq kir ku pezekî wî tune ye. Wenda bûye. Li vî alî reviya nedît. Ber bi aliyê din ve çû nedît. Ji yek du hevalên xwe yê din pirsî wan jî nedîtibû. Neçar mabû. Nizanibû çî bike. Hêdî hêdî êdî roj diçû ava. Ji alikî de ditirsiya biçê malê. Ji aliyê din ve naxwaze jî piyên wî ew ber bi malê ve dibir. Pez xwe bi xwe ber bi gund ve diçû. Digiriya hêsiyên çavan, lîka wî û gilêza ji dev rijyayî tevlihev bûbû û dihat xwarê.

Dem a xalê Misto ew dît di rewşêke awiha de bû. Gava xalê Misto ew dît ewil got qey dîsa ew û hevalên wî li hev û din xistine. Lê gava meseleyê hînbû, bi hêrs çend gotin ji wî re gotin. Lê wext tunebû ku bisekine. Lewra roj diçû ava. Beriya tarî dakeve erdê dixwest pezê wendayî bibîne. Loma ew û çend gundiyan din ên ku li qada gund bûn ketin nav liv û tevgerekê. Piştî gihîştin bin dara Salih, di bin de razabû her yek bi aliyekî de belav bû. Li pezê wendayî digeriyan. Gava yek ji wan pez dît ew ê gazî hevalên xwe bikira. Ji ber ku ew jî vegerin. Bîlesebeb li wan çol û çiyayan negerin.

Piştî qederekê, bi qasî niv saet an jî çil deqeyî Selmanê kurê Nazo pez dît û paşve vegeriya. Ji alikî de jî diqêriyan û gazî hevalên xwe dikirin. Xalê Mstefa, Şikrî, Salih, Ehmedo!.. werin!.. min pez dît!..

Salih, Ehmed û Şikrî gava deng çû wan dev ji lêgerîne berdan û vegeriyan. Lê deng ji xalê Misto derneket. Qet pêjna wî nedihat. Gava ên din gihîştin ba hev Selman hê jî gazî xalê Misto dikir. Lê dîsa qet deng ji wî nedihat.

Xalê Misto dema ji dîr ve dengê Selman bihîst xwe bi xwe got; “De baş e. Waye ez ê paşve vegirim. Waye siheta te xweş Selman! Te îşev min ji ezabek û

xezebek mezin xelas kir. Xwedê çî miradê te hebe bide.” Piştê bi aliyê gund ve vegeriya. Darê xwe wek ku wan bihîstiya û bersiv dide wan hejand û ber bi gund ve meşîya.

Carcaran ên din jî diqêriyan û ber bi qada gund ve diçûn. Gava deng ji xalê Misto derneket yek ji wan got; “Me pez dît lê îcar me xalê Misto wenda kir. Hûn dixwazin bila yek ji me pez bibe gund. Em ên din jî li xalê Misto bigerin. Feqîrê xwedê bila îşev bîlesebeb li van çol û çiyayan nemîne.”

Tev bi hev re diqêriyan. Gazî xalê Misto dikirin. Lê deng ji wî derneket. Piştî qederekê gava deng ji xalê Misto nehat ew jî neçar man ku paşve vegerin qada gund. Gava gihîştin qada gund tu kes nedît. Li wir tu kes tunebû. Dereng bû êdî. Ji ber vî fikar bûn. Bîstek ji bo çawa tevbigerin nîqaş kirin. Piştê re yek ji wan got; “Jixwe waye me pez dît. Em hinek din jî li vir bisekinin. Heke nehat em ê îcar jî li wî bigerin. Heyf e. Bila ji bo pezekî heta serê sibê li van çolan nemîne.”

Piştê dîsa wek her carê di nav xwe de li ser pirsîyê rojane nîqaş kirin. Niv saet derbas bû, wan jî amadekariya xwe kir, ku îcar herin li xalê Mstefa bigerin. Gava ji gund derketin hê çend gav avêtin neavêtin ji dîr de reşahîyek dît. Ew jî ber bi wan ve dihat. Çend gavên din nêzî hev bûn yek ji wan got; “Ev xalê Mstefa ye tî!”

Ew ji meşa wî naskiribûn. Bi rastî jî çend deqe şûnde xalê Misto gihîştibû ba wan. Lê xuya dikir ku pir aciz bûye. Silav dan hev û din û li ser piyan çend gotinan gotin. Êdî hêdî hêdî amadekariya xwe kirin ku biçin malên xwe. Lê Selman xwe negirt û got; “Xalê Mstefa me ew qas gazî te dikir, gelo dengê me qet nedihat guhên te? Te qet dengê xwe nekir û bersiva me ji neda.”

Xalê Misto li hember vî pirsê bêhnekî kûr kişand. Bêhna xwe girt û berda. Girt û berda. Hinav lê neman. Wisa xuya bû ku ew jî pir aciz bûye. Û li ser vî pirsê xwe negirt û got; “Hey malnemîrat. Min jî ew qas serê xwe dihejand. Ma we nedît. Hê jî qîreqîra we bû. Xalê Mstefa û hey xalê Mstefa...”

Piştî vî bersivê her tiştî ji bir kirin. Gava ber bi malên xwe ve diçûn hê jî dikeniyên...

Çîroka min a fêrbûna kurdî

Şerîf Yılmaz

Hevalno ez ewil ji we re bibêjim. Ez ne pisporê zimanê kurdî me. Lê ez evîndarê zimanê kurdî me. Ez bawer im sala 2002'yan, rojnameya Azadiya Welat derdiket. Kesê pir nedixwend. Min got ez kurd im, vaye rojname jî bi kurdî ye. Çima ez nikarim bixwînim. Min biryara xwe da ku ez fêrî xwendin û nivîsina zimanê kurdî bibim.

Ferhengoka kovara Pîneyê hebû. Min ferhengok û Azadiya Welat standin û dest bi xwendinê kir. Ez fêrî xwendin û nivîsandinê bûm. Li Semsûrê Kurdî-Der hat avakirin. Ez beşdarî xebatên Kurdî-Derê bûm. Min got hewce ye ez mamostetiya zimanê kurdî bikim. Ez çûm perwerdeya mamostetiye. Min di sala 1978'an de dibistana navîn qedandibû. Ez rêzimana tirkî jî û ya kurdî jî nizanibûm.

Di perwerdeyê de mamoste dibêje lêker, ez dibêjim mamosteyê hêja lêker çî ye? Mamoste dibêje fiil e. Lê fiil çî ye? Dema mamoste digot fiil ew sewalê mezin dihat bîra min. Dibe ku bi hevalan ecêb were lê mixabin rastiya me ev e. Ji bo ku deshilatdaran nehiştîye ku ji heft saliyê şûn da em bi çand û zimanê xwe mezin bibin, ez wateya lêker û fiilan nizanîm. De werin hevalno ji bin vî barê giran derkevin. Ku tu çî karî bikî, evîni tune be tu bi ser nakevî.

Min ewil gotibû ez ne pisporê zimanê kurdî me. Lê ez evîndarê zimanê kurdî me. Ji bo ku eşqa zimên bi min re hebû min lêker û fiil bi hev re hîn kirin. Rêziman gelek kedê dixwaze. Niha jî ez mamostetiya asta yekemîn û ya duyemîn dikim. Hevalên hêja û rêzdar bi kurt û kurmancî, ger hûn naxwazin ziman, çand, dîrok, nasname, wêje, ax, welat û hebûna we wenda bibe li zimanê xwe xwedî derkevin.

Kesên bibêjin em nikarin fêrî zimanê kurdî bibim, ger evîna zimên bi wan re hebe, ez bawer dikim ku dê di demeke kin de fêrî xwendin û nivîsina zimanê kurdî bibin. Kî bibêje ez nikarim hîn xwendin û nivîsina zimanê kurdî bibim, ez ê jî wan re jî wiha bibêjim; gotinek li bajarê Semsûrê heye, dibêjin kîloya mena tîjî nabe. Ez dê nivîsa xwe bi gotineke gorbihûştê nemir Bedirxan Beg bi dawî bikim. Dema Bedirxan Beg dike biçê ser dilovaniya xwe ji zarokên xwe re dibêje; “Hûn bi zarokên xwe re bi kurdî biaxivin. Ku hûn bi zarokên xwe re bi kurdî neaxivin zarokên we dê zimanê kurdî jî bir bikin. Ku zimanê kurdî jî bir bikin dê Kurdistanê jî jî bir bikin. Ziman hîmê welat e.”

Ez bi van hest û ramanan xwendevan û gelê me bi dil û can silav dikim.



Bi vîrûsê re rûbirû tîn hiştin

Piştî belavbûna vîrûsa koronayê, girtîgeh cihên ku herî bi risk hatin pênasekirin û bû rojeva sereke. Mafên heyî yên girtiyan bi hinceta tedbîrên tenduristiyê ya li dijî vîrûsê tîn bînpêkirin

Navenda Nûçeyan

Bilançoya vîrûsa koronayê her ku diçe giran dibe. Her roj dane diguherin. Bi sedan welat niha li hemberî vîrûsê di nav liv û tevgerê de ne. Her welat li gorî xwe tedbîr digirin. Ligel tedbîrên ku tîn girtin jî vîrûs her ku diçe belav dibe. Li gelek welatan derketina derve hat qedexekirin, hin welat jî di nav de Tirkîye jî heye tenê banga li malên xwe dernekevin tîn kirin.

Li Tirkîyeyê jî her roj dane diguherin. Piştî ku hejmar zêdebûn sazî û dezgehên fermî yên dewletê ketin nav hewldanan. Her roj Wezîrê Tenduristiyê bi rêya twitterê rewşa heyî û daneyên dawî parvedike. Hefteyên borî Lijneya Zanariyê diyar kir ku Stenbol, Enqere, İzmir, Antalya û Wan bajarên herî bi risk in. Lê baweriya civakê jî daneyên ku tê parvekirin nayê. Ligel belavbûna nexweşiyê, di nava civakê de tirs û fikar jî mezin bûye.

Hişyarî didomin

Dibistan heta 30'ê nîsanê hatin girtin, qehwexane, kafe, xaringeh, cihên mezin ên danûstandinê, berber û kuafor cihên ku rîska belavbûnê hene hatin girtin. Ji bo kesên bi temen mezin biryara qedexeya derketina derve hat dayîn. Ev tişt biryarên dezgehên fermî yên dewletê ne. Ji bilî hewldana dewletê rêxistin, sazî, dezgehên sîvil û partiyên siyasî jî li gorî derfetên xwe dest bi xebatan kirin. Her beş di çarçoveya rol û mîsyona xwe de tedbîr digirin. Herî zêde bangewaziyên "Ji bo hezkiriyên xwe jî malên xwe denekevin, paqijîya xwe baldar bin" tîn kirin.

Rewşa girtiyan nexweş

Her tim rewşa girtiyan siyasî di rojeva Tirkîyeyê de bû. Li gorî daxuyaniya Wezîretê Dadê bi tevahî li Tirkîyeyê 260 hezar girtî hene. Li gorî rapora sala 2019'an a Ko-

meleya Mafên Mirovan (ÎHD), li girtîgehên 458 jê giran bi giştî hezar û 334 girtiyan siyasî yên nexweş hene. Li gorî daneyên Tora Lêkolînê Zarokan a Amedê jî bi giştî li Tirkîyeyê 3 hezar û 19 zarok girtî ne.

Li girtîgehên pêkufî didomin

Bi hezaran kes jî ber fikr û ramanên xwe girtî ne. Dewlet, li dijî fikr û ramanên azad tenê girtîgehên nû ava dîke û li hemberî girtîgehên jî politikayên taybet dimeşîne. Ji ber politikayên demêr dawiyê êdî kapasiteyên girtîgehên nû jî terê nakin. Koguşên ku 20 kes lê bimînin 40 kes dimînin, an 8 kes lê bimînin 16 kes dimînin. Bi taybetî jî piştî grevên birçîbûnê pêkutiyên li hemberî girtiyan zêde bûn.

Girtîgeh cihên herî bi risk in

Piştî belavbûna vîrûsa koronayê, girtîgeh cihên ku herî bi risk hatin pênasekirin û bû rojeva sereke ya raya giştî. Dezgehên eleqedar yên dewletê jî bo pêşî li ber vîrûsê bigirin hin tedbîrên balkêş girtin. Astengkirina hevdîtîna ya bi malbatan re, zêdekirina mafê axaftinê ya bi telefonê re û dezengfekteya girtîgehên wekî tedbîr hatin girtin.

Tedbîrên nayên girtin

Li gorî agahiyan malbatên girtiyan piştî belavbûna vîrûsê bûhayên malzemeyên paqijiyê li kantînan hatine zêdekirin. Ava

germ û sabûn nayên dayîn. Ji bo dezengfekteya koguşan tiştêk nayê kirin. Pirsgerêka paqij çêkirina xwarin û vexwarinê jî hêj didomin. Lepik, maske û madeyên dezenfekteyê nayên dayîn. Heke girtî bixwazin cara duym bi rêya telefonê jî malbatên xwe re bi xwestin. Ligel rîska vîrûsê heye li girtîgehên sirgunkirina girtiyan didomin û dema tîn sirgunkirin jî bi şideta fizîkî û derûniyê re rûbirû dimînin. Kontrolên tenduristiyê yên girtiyan rêkûpêk nayên kirin.

Li 12 girtîgehên lêkolîn

Gelek sazî, rêxistinên sîvil û partiyên siyasî derbarê rewşa girtiyan de daxuyanî dan, bal kişandin ser rîskên heyî û her wiha tedbîrên ku ji hêla dewletê hatin girtin jî rexne kirin. Hefteya borî parêzerên Federasyona Komeleyên Piştevaniya Hiqûqî ya bi Malbatên Girtî û Hikumxaran a Med (MED TUHAD-FED) û Komeleya Hiqûqnasên Ji Bo Azadiyê (OHD) çûn serdana 12 girtîgehên herêmê. Derbarê rewşa girtîgehên herêmê de raporek amade kirin. Li gorî raporê rêgezên ji bo vîrûsa koronayê hatine aşkerekirin tîn piştguhkirin û li girtîgehên her çiqas kontrola tenduristiyê hatibe kirin jî kêmin.

Girtiyan siyasî nayên efûkirin

Malbatên girtiyan û raya giştî xwestin hemû girtî serbest bûn berdan lê belê, di çarçoveya pa-

kête 3'yemînê Darazê de tenê ji bo 100 hezar girtiyan biryara berdanê de bû dayîn. Her wiha hemû girtiyan siyasî jî derveyî vîrûsê hatin hiştin. Raya giştî li benda efûkirina hemû girtiyan bû, lê belê tenê kesên ku bi sîncên edlî hatine girtin de bû berdan. Her wiha CHP'ê jî piştgirî da lihevkerina AKP û MHP'ê.

Ji bo girtiyan kampanya

Li dijî rîska vîrûsa koronayê ya li girtîgehên, bi pêşengiya MED TUHAD-FED û komeleyên ku girêdayî wê kampanyayek hat destpêkirin. Di çarçoveya kampanyayê de ji Navenda Ragihandinê ya Serokkomariyê (CIMER) re daxwazname tîn şandin û daxwaza berdana girtiyan siyasî tîn kirin. Her wiha raya giştî li ser rewşa Îmraliyê jî disekin û daxwaz dikin ku tecrîda li hemberî Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan, Omer Hayrî Konar, Hamîlî Yildirim û Veysi Aktaş bê rakirin. Wezîretê Dadê der barê Îmraliyê de heta niha tu agahî nedaye û ev jî fikara malbat û parêzeran her ku diçe zêde dîke.

Her wiha ji hêla parlamenterê HDP'ê yê Kocaeliyê Omer Farûk Gergerlîoğlu ve bi sernavê "Di pakêta darazê de cih ji cudakariyê re nîne - Ji bo girtiyan siyasî jî wekhevî" kampanyaya îmzeyan hat destpêkirin. Kampanya hefteya borî destpêkiribû û di nava sê rojan de hejmarê îmzeyan gihaşt 55 hezaran.

Ji saziyan pêşniyarên tedbîrê

Rêveber û nûnerên Komeleya Civakî Sîvil a Pergalên Cezayê Înfazê (CİSST), Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD), Odeya Hekîmên Dîranan, Odeya Bijîşkan a Stenbolê, Sendikaya Kedkarên Xizmeta Tenduristî û Civakî (SES), Weqfa Lêkolînê Civakî û Hiqûqê (TOHAV), Weqfa Mafên Mirovan a Tirkîyê (TİHV), Komeleya Hiqûqnasên Ji Bo Azadiyê (OHD) û Komeleya Înisiyatîfa Maf li dijî vîrûsa koronayê çend pêşniyarên kirin. Pêşniyar wiha hatin birêzkirî:

✓ Ji bo şewba vîrûsa koronayê were astengkirin, divê li hijyena ta-kekesî girîngtirîn baldarî hebe. Lazîme tenduristiyê girtiyan were parastin. Ji bo girtî dikarin paqijîya

xwe bikin lazîme demildest kelûpelên paqijiyê beles bidin wan.

✓ Qadên hevpar ên mîna daşir û serşok her roj werin dezenfektekirin.

✓ Ji bo girtî bi awayê têrkirî, bi hevsengî û tenduristî werin xwedîkirin lazîme vîtamîn qet kêmin nebin.

✓ Pêwîst e girtiyan nexweş, astengdar, extiyar, zarok û ducanî bi rêya şertên kontrola edlî werin berdan û cezayên wan bînpêkirin.

Berevajî vîrûsê jî lazîme girtî ne li cihê qelebalix û li cihên guncav ên kapasîteya wan heye û hijyen werin ragirtin.

✓ Lazîme dosyeyên girtiyan nexweş werin lêkolînkirin û demildest li derveyî girtîgehê werin der-

mankirin.

✓ Pêwîst e pêşniyar û hişyarîyên Wezîretê Tenduristiyê û Yekîtiya Bijîşkên li ber çavan were girtin. Lazîme personelên girtîgehê werin agahdarkirin û li gorî rêgezan tevger bikin.

✓ Divê kesên diçin girtîgehê di warê pêşîlêgirtina şewbê de werin agahdarkirin û kes nêzî girtiyan nebin.

✓ Di serî de xebatkarên tenduristiyê û hemû xebatkarên temasê bi girtiyan re deynin divê cilên parastî li xwe bikin û kelûpelên baş werin xwestin. Ji bo xebatkarên girtîgehê jî divê tevdirên pêwîst bigirin û werin agahdarkirin.

✓ Divê ji bo girtî, xizmên girti-

yan û xebatkarên girtîgehê test bûn kirin û tedbîrên girtin. * Li cihê ku hevdîtîna tîn kirin bîyê ku mafê girtiyan ê hevdîtîna bê bînpêkirin, tedbîrên bi lez bînpêkirin û bînpêkirin.

✓ Li şûna ku girtiyan di wesayîtan ringê de bibin nexweşxaneyan, bi wesayîtan paqij û ji tenduristiyê re guncav bibin.

✓ Tedbîrên ku bi hinceta tenduristiyê tîn girtin divê ku bi rengekî ku mafên girtiyan bin pê nekin bînpêkirin.

✓ Têkildarî tedbîrên ku ji bo vîrûsê tîn girtin û de bînpêkirin û encamên wan di serî de malbatên girtiyan û parêzer û raya giştî bê ragihandin."

Dilan Aydın



Kî ne û çî ne?

Wekî xewnerêşê ye carna jiyana û bûyerên lê diqewimîn. Bi giraniya xwe aqil û giyanê însan mijûl dikin, nahêlin dem û jiyana rehet, xwezayî û asayî derbas bibin... Nahêlin; roj û şev bi aramî û xweşiya demên salê werin jiyîn!

Car caran bi hezaran gotinên negotî xwe tînin ser zimanê me. Dixwazin; em bi hevokan wan webêjin... Raman û hestên me bi wan der bibin... Ji nava qefesa dilê me azad bibin! Lê... Tewş e! Ji sedî dehê wan; ji vegotina me bêpar dimînin, me jî xwe jî bi poşmaniye re rûbirû dihêlin.

Van rojan qêrîna ji zindanan a negihîje me dibihîsim! Bi roj û şev her keli dengê wan tê guhên min, rûyê wan ê roj bi roj, sal bi sal, diguhere tê ber çavên min. Dibêjin; 'cîh û mekan ji bo me bi sînor e... Em zindani ne, hûn me nabînin, bi saetek sînor kirî ye hevdîtina me û we! Em zindani ne, berê me li diwarên herî sar, dilê me dagirtî, hêviya ku bi salan e em li bendê ne, hê pêk nehatiye! Em bêrî û hesreta mezin-tîrîna a vî cihanê ne.'

Gelo çend kes bîyê ku vîrûsê yekê bîjin dikarin his bikin? Girtî çî ne, kî ne, ji bo çî 'li wir' in? Gelo kî ne yên bi dehan salan girtî... Kî ne yên bedena wan di nava diwaran de hatiye dîlgirtin? Ka em çavên xwe bigrin û xew bixin cîhê wan... Em destên xwe bidin ser dilê xwe û his bikin, bedena me dehan salan di qefesê de be, em ê çawa bîjin! Ger em mercên zindaniyan neynin pêş çavên xwe, rojê carek xwe nexin cîhê wan; em ê kî bin, çî bin û çawa bin?

Her sal, bi hatina biharê re bendewariya azadbûna ji dojehê dijîn girtî! Her sal bi hêviya gotin û hevokên di cîhê de ku bi xwe re azadiyê bînin, deriyên wan dojehan vekin dijîn! Lê... Gotin û kirin wisa dubare, wisa qels û wisa bê îsabet in ku; ne ji bo rewşên lezgin ji bo mijarên din in. Ne ji bo hezaran, ji bo çend kesan daxwaza berdana ji zindananê tê kirin! Di van rojan ku fikara belavbûna vîrûsa nebixêr her diçe zêdetir dibe, 'em ên li derve' ji bo xwe û derdora xwe tedbîran digrin, xwe diparêzin lê ji derveyî daxuyaniyan an jî axaftina çend kesan, ji bo zindanan em çî dikin? Ew dojehên ku ji xwe bi nexweşî û xeterên mezin dagirtine; niha jî bi xetera ku 'derdê ser derdan e' re rûbirû ne. Helwesta me wisa qels e ku divê dilê me ji me li hev bike! Lewre li cîhê em bi şev û roj bi hev re ji bo azadiya tevahî girtiyan (bi taybetî yên bi dehan salan girtî û nexweş) bixebitin; em hê jî bi gotinên dubare yên ji 2009'an ve li ser zimanê me bûne nakarat behsa berdana 'hinek' girtiyan dikin!

Wijdanê me yê civakî yê bi daxuyani û bendewariyan bi salan e teviyî û xwe têr dibîne divê bi rexneyên dijwar xwe zelal û paqij bike. Yên girtî xwişk, bira, dê û bavên me ne û her yek ji wan nefereke têkoşinê ye, bedel dide. Heta ku em 'wekhev' nêzî kesên di dojeha vî cihanê de dijîn nebin; em ê şaş û bebes bin. Peywira însanbûn û kurdîbûnê ev e, têkoşin û şoreş ev bi xwe ye!

'Vîrûsê pergala kapîtalîst hejand'

Li tevahiya cîhanê ji ber virûsê jiyana rawestiya û niha hemû welat li dijî krîza koronayê rê û rebaz digerin. Bijîşk Ozgur Bîngol diyar kir ku virûsê bi tena serê xwe pergala modernîteya kapîtalîst hejand û tedbîrên tî girtin polîtîk in ne zanistî ne

Dr. Erdal Sîpan

Roj bi roj bilanço ya virûsa coronayê diguhere. Li tevahiya cîhanê niha krîzek mezin heye. Aliyek ji bo dîtina aşiyê hewlêdan hene û aliyek jî li dijî belavbûnê tedbîrên tî girtin. Ligel tedbîr û hişyariyên ku tî kirin jî virûs belav dibe. Ozgur Bîngol li fabrîqekê bijîşk e dixebite û ji rojnameya me re behsa belavbûna virûsê û taybetiya virûsê kir û bal kişand ser rê û rêbazên xwe parastinê.

Ozgur Bîngol di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser virûsa coronayê û da zanîn ku virûseke zoonotîk e ango ji ajalan derbasî mirovan dibe û corona navê malbateke virûsan e û wiha got: "Ev virûs bi rêya hilmê derbasî laşê mirovan dibe. Ji dev, poz û çavan re dikeve laş. Di gewrî û pişik mirovan de bi cî dibe."

Gelek caran behsa gelo ev virûsa nû (2019- n COV) çawa derket holê cudatîyên wê ji yê din çî ne hatin kirin û bijîşk Bîngol wiha behsa çîroka derketina virûsê kir: "Ev virûs li bajarê Wûhanê yê Çînê cara yekem hatîye dîtin. Zanyar li ser wê dibêjin ewil ji baçermokê an jî ji ajalên kûvî derbasî kesekî/bûye. Cudahiya wê ji cûreyên koronayê yê berê, pir zû belav dibe û hê ne dermanê wê ne ji aşiyêke wê peyda bûye."

'Dilopên li hewa asê mane...'

Bîngol bal kişand ser virûsa koronayê çawa derbasî mirovan dibe û nîşaneyên nexweşiya wê çî ne wiha dirêjî da axaftina xwe: "2019- nCOV bi rêya dilopên li hewa asê mane derbasî mirovan dibe. Ev jî piranî bi kuxik û destê mirovên nexweş li derdorê belav dibe. Kesên din bi destên xwe yan jî rûbirû ve virûsê digirin laşê xwe." Wezareta Tenduristiyê bang li temen mezin kir ku xwe biparêzin û demekevin derve, virûsa ku bi taybetî li ser mirovên temendirêj bandora xwe nîşan dide, Bîngol wiha got: "Sedema bandora li ser mirovên



temendirêj qelsiya pergala îmmûnîteyê (xweparastina cêstê) û nexweşiyên kronîk ên berê ne û li ser temen mezinan bi bandor e."

Tedbîr û paqijî

Demek dirêje li ser xwe parastin û tedbîran nîqaş tî kirin û pîrsa herî zêde tî kirin jî gelo em ê xwe çawa biparêzin? Bîngol rê û rêbazên parastinê wiha anî ziman: "Bergiriya ewil, ji nexweşan dûrketin e lê wekî me got her tim ne pêkan e ku were zanîn; kî nexweş e. Ji ber wê yekê divê em ji nav civatê û ji komên mirovan dûr bisekinin, paqijiya şexsî; bi tay-

betî jî dest şuştin girîng e. Heta jî destê me bê divê em destên xwe li derdorê û kesên din nexin."

Bîngol bandora modernîteya kapîtalîst li ser derketina wê virûsê jî wiha şîrove kir: "Lê rastîyeke wê virûsê; bi tena serê xwe hêz û pergala modernîteya kapîtalîst hejand. Û nîrxên kapîtalîzmê dîsa anîn ber çavan, ew jî ev bû; heta pergala aboriya dewletan nehejiya, tu dewlet li ser wê nexweşiyê nesekinî û êşa mirovên derveyî welatê xwe ji we ra nekirin xem. Yanî xema kapitalîzmê tenê aborî ye û destkeftiyên wî yê desthilatdariyê ye."

Li Tirkiyeyê jî her diçe hejmara nexweşan û miriyan zêde dibin û tedbîrên ku heta niha hatine girtin jî terê nakin. Bijîşk Ozgur Bîngol, mijara pêşilêgirtina nexweşiyê wiha nîrxand: "Heke zanyarên navnetewî dermanekî an jî aşiyekê nebînin, wê virûs zêdetir belav bibe û wê pir mirov jiyana xwe ji dest bidin. Tedbîrên ku dewlet digire jî pir kêmtir in û polîtîk in ne zanistî ne."

Barê herî giran li ser milê sazî dezgehên sîvîl û bi taybetî jî li ser milê xwebatkarên tenduristiyê ne û divê xwedî li tîkoşerê wê bûyerê (tenduristvanan) derkevin.

Bîlanço giran dibe

Virûsa koronayê ku heta niha li nêzî 200 dewletan belav bûye, li tevahiya cîhanê jî 500 hezarî zêdetir kes pê ketine û herî kêmtir 24 hezar kes jî pê mirine. Li Îtalyayê tenê heta niha jî 8 hezarî zêdetir kes jî ber virûsê mirine. Li gorî daneyên fermî, li bakurê Kurdistan û Tirkiyeyê jî 11'ê adarê vir ve 75 kes bi virûsê mirine û encamên testên

3 hezar 629 kesan jî pozîtîf derketine. Wezareta Tenduristiyê ya Herêma Başûrê Kurdistanê daxuyand ku li gorî encamên testên heta niha hatine kirin 113 kes bi virûsê ketine û 2 kes jî pê mirine. Qedexeya derketina derve ya li başûrê Kurdistanê jî berdewam e. Li rojhilatê Kurdistanê û tevahiya Îranê jî 2 hezar û 378 kes bi virûsê mirine

û jî 32 hezarî zêdetir kes jî pê ketine. Li rojavayê Kurdistanê li deverên di bin serweriya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de heta niha kesekî/bi virûsa koronayê ketîye nehatiye tomakirin. Li rojavayê Kurdistanê jî jî 23'ê adarê vir ve qedexeya derketina derve hatîye ragihandin.

Nîşaneyên nexweşiyê

Bijîşk Bîngol der barê nîşaneyên nexweşiyê, îhtîmala ku virûs girtine û dema virûs dikeve bedenê çawa tev bigerin de û wiha got: "Nîşaneyên wê nexweşiyê yê sereke, agirê bilind, hilmvedanek bi zehmet û kuxik in. Dema ku virûs dikeve laşê mirovan hema di keliyê de nexweşiyê çênake, demeke înkubasyonê (dema bédengiyê) heye û paşê nîşaneyên nexweşiyê derdikevin holê. Ji ber wê yekê dibe ku kesên nîşane pê re tune bin jî nexweş bin."

Tedawî hêj nehatiye dîtin

Piştî ku virûsa koronayê derket holê zanyar û bijîşk li ser tedawiya wê nexweşiyê sekinin. Ozgur Bîngol jî diyar kir ku tedawiya wê nexweşiyê ya teqez hêj nehatiye dîtin û aşî jî hêj nehatiye peyda kirin û wiha nêrinê xwe anî ziman: "Li gorî rewşa asta nexweşiyê (rewşa nexweş û virûsê çîqas bandor li ser pişikê kiriye) tedawî tê diyarkirin. Ev jî piranî ne li ser tedawiya nexweşiyê ye li ser êş û gazinên nexweş e. Armanceke tedawiyê jî daxistina mîjera virûsê ye."

Di destpêka civakbûyînê de tîkiliya "civak-mirov, mirov- xweza" li ser sazgerêke sîmbiyotîk pêk dihat. Ango, beramberê hev de, hev du xwedî dikirin û pêdiviyên xwe pêşwazî dikirin. Dema mirov pêdiviyên xwe ji xwezayê didît, tu carî zîrê nedida axê, avê, hevayê û dar û beran. Qasê hewcehiya xwe digirt û ji xwezayê re spasîyên xwe jî pêşkeş dikir. Ji ber ku xweza, ji her aliyê ve mirovan xwedî dikir û kêmasiyên wan jî holê ra dikir. Mirov av dida axê, ax jî nan dida mirov. Ji ber wê yekê xweza (av, ax, heva û agir), ji bo mirov û civakê nîrxekî herî mezin û pîroz bû. Her demsal, wek xwedawendekê bû. Her bûyerên tebiatê jî bo berdevamiya jiyana mirovan, wek dermanekî bû. Av, zêdehi/bereket bû, baran rehmî bû. Agir ronahî û paqijî bû, berf jî bo zayina jiyaneke nû wek tov bû.

Mirov jî perçeyek ji xwezayê bû. Perçeyekê bi aqil, bi hest û bi raman. Bi aqilê xwe, li hemberî şert û mercan xwe parast, tîr kir û zêde bû. Bi hestên xwe ve (taybetî jî) ji zimanê xweza fehm kir û tîkilî danî. Bi ramanê xwe ve jî, xwezayê wek xwedawendekê dît, li hemberî tebiatê

Mirovahî û Korona

Abdurrahman Sever

rêz girt û jiyana xwe jî li gorî wê yekê dizayn dikir. Hemû hilberîna xwe qasê pêdiviyê xwe çêdikir. Dema berhema zêdehi jî çê bîba, civak, ji forma xwe ya komunalê dernediket û bi edaletî ve berhemên zêde dihat parvekirin. Ji ber wê ye ku, tu carî nexweşiyên bêderman an jî pîrsgirêkekî bêçare nediket nav civakê. Mirov jî xwezayê, xweza jî ji civakê hez dikir.

Xweza, tu carî jî mirovahiyê re ixanet nekir û mirovan neçand. Jixwe, nexweşiya evîl, ne ji xwezayê; ji mirovan ket nav civak û mirovahiyê. Nexweşiya evîl çî bû? Milkperestî û ixtidârî... Li ser berhemên zêde talanekî û xespekî dest pê kir û roj bi roj mezin bû. Ji bo milkperestî û desthilatdariyê, serî de xweza, pişt re jin û civak hat talankirin, perçekirin û daliqandin. Hemû nîrxên xweza û civak hat binpêkirin. Aqil, hest û ramanên mirovahiyê hat derpkirin. Piştê nexweşiyên evîl, xêrnexwazî, talan û trajedî

xilas nebû. Êdî şerê di navbêra xwedawendên xwezayî û Qral-xwedê; şerê başî û xirabiyê; şerê ronahî û tarîtiyê li ser rûyê erdê bi awayekî dijwar dest bi kiribû. Şerê cîhanê ya yekemîn di esase xwe de bi wê şekî ye. Di aliyekî de desthilatdarî, dagirkerî û mêtîngerî; di aliyên din de jî mirovahî. Êdî jiyana cîhanê li ser wê du xetê meşîya û her çîqas dem derbas bû şer giran dibû. Dagirkerî, ji armanca xwe ya talankirinê û hegemonyayê derbas nebû û dev jê berneda, tîrê nekir, di her serdemê de kolonîstiya xwe mezin kir. Lê mirovahî jî tu carî jî berxwedêriya xwe gaweşkî şûnda neavêt û ji armanca xwe ya azadî û xwe birêvebirine dûr neket. Dem dem mirovahî berê tîkîyîyê çû, wê çaxê jî xweza, mirovahiyê tenê nehişt û bi bûyerên balkêş ve, desthilatdaran asteng kir. Tê gotin ku, Nemrûd bi mîşekî dimire, Fîravûn di bin behrê de dixendiçe...

Di her serdemê de bûyerên mezin

a xwezayê diqewime û ew bûyerê jî dibe sedem û çawkanîyên awakirin û sazûmana civak a nû. Eger, ev pêvajoyê baş neyê şopandin, civak li gorî pîvanên sîncî neyê dahûrandin; wê çaxê civaka ku nû ava bûye, dikeve bin bandora rêxistinên totalîter û xwe bi awayekî nû dike qurbana kapîtalîzmê. Lê, ger ku ew civak, li gorî rîhê mirovahiyê xwe rêxistin bike wê demê sazûmana civaka nû, ji bo sosyalîzasyona mirovahiyê, dê bibe sedemêkî mezin.

Wek tî zanîn, rojên dawiyê de jî vîruseke pir zû û zêde belav dibe, bi tundi ketiya rojeva me. Di nav demekî kurt de li gelek deveran belav bû. Taybetî jî li dewletên desthilatdarên rûyê erdê de pir zêde bandorekî çêkir. Balkêş e ku ew dewletan jî bi sed salan e derveyê welatên xwe de an şerê pir mezin û aloziyan derxistine û derdixin an jî bûne şîrikê dijîmîroviyê. Bi bandora nexweşiya yekem (ixtidat/milkperestî) ve talanekê pir mezin çêkirin,

him li ser civakê him jî li ser xweza/tebiatê. Lê tîştêkî jî bîr kirin; xweza bi mirov dikare jiyana bike, lê mirov nikare bê xweza bîji. Ji ber wê yekê, talankirina xwezayê, bi xwe re mirina însanan jî tîne. Çîqasî şer û talan mezin û giran be, bûyerên wekî koronayê jî berfireh dibe. Webaya reş, kolera, tîfo û hwd. li gorî dem û şerê dirokan, minakên girîng in.

Niha jî virûsa koronayê temamê welatên Evropayê belav bûye û heta pergala daye sekinandinê. Şerê Rojhilata Navîn dayîn aliyekî, ev virûsa nahêlê mirovên ku xwe wek Xwedê nîşan û rave didin serê xwe ji menzela qesra xwe derbixînin. Tevahiya wan bêçare ne. Hemû tîst destê civakê de ye. Dibe ku li gorî feylesofan, bi wê bûyerê ve nîzama û sazûmana civaka nû jî çêbibe, lê, veyrusa ku wek tola zarok, jin û xwezayê digre, peyama xwe jî vekirî dide; "ger pîvana mirovahiyê were esas girtin, mirov jî xwe û jî xweza re rêzdar bibe; hev du bifikire, ji bo hev du jiyane ava bike û fedekar bibe, dê mirov/ahî xwe rizgar bike. Nexwe, xwedeyên pergala û qesran bêçare ne. Çareserî, xwe bi xwe birêvebirin e û civak bi "xwe" ye."



'Evîn'ek ku tim evîndar bû!

Evîn tenê 27 salan jiya lê jiyana wê pirbar bû. Jiyan kurt an jî dirêj rojekê yê bigehêje baregeha xwe ya dawiyê lê di 'qamûsa wijdanê' de navê mirovên hêja û xwedî armanc nayên jibîrkirin

Kakşar Oremar



Gotina dawiyê mirin e, lê mirin jî bi hebûn û jiyane nîkare. Jiyan tenê liv û lebata li ser rûyê erdê nîne, çimkî ew ên ku di dema jiyane de kêlî bi kêlî xwedî rêbaz û armanc bûn, yê tim bi nemirî bimînin. Dema kesek li pey 'mirina fizîkî' tim bi ked û xizmeta xwe diyar û li ber çavan e, gelo êdî çawa dikare bimire?

Evîn Buldan ji malbateke naskirî a eşîretên herêma Colemêrgî ye. Malbatek ku di jiyana siyasî-civakî a kurdan de xwedî rolên çend alî: him erênî û him jî negatîf bûye. Di serhildana Oremar a sala 1930'an de hinek ji endamên wê malbatê li kêleka dagîrkêrên tirk bûn û tevî hinek serok eşîretên din yê herêmê li dijî şoreşgerên kurd bûn. Belkî ji bo parastina hebûna eşîret û wêranekirina gündê herêmê ev rêbazê hemû rihspiyên kurd bû, lê nabe em vê rastiyê jî ji bir bikin ku di hemû serhildanên siyasî ên sed salên derbasbûyî de rolê axa û began piranî negatîf bûye. Em vê rewşê di nava eşîret û malbatên Şikak, Bedirxanî, Barzanî, Caf û hwd de jî dibînin.

Nifşeke din

Ji salên 1960'an û şûnde nifşeke din yê malbata Buldanîyan pêdigehe ku kurd perwer û haydarî rewşa siyasî li Kurdistanê ne. Nejdît Buldan kesê herî diyar yê malbatê ye ku piştê dibe şaredarê bajarê Geverê. Kar û kiryarên wî yê wan çend salan ku şaredar bû, hê jî ji bira xelkê neçûne û weke mîrarkirin. Ew haydarî dîroka welatê xwe û li kîderê agirê şoreşê germ bûya, ew jî bi dizî an jî êşkere li wira bû. Carna li 'Rajanê' û piştê jî bi endabûna xwe a di DEP'ê de xebateke nû dide meşandin. Li pey alfigirên siyasî li Tirkiyeyê û bakurê Kurdistanê enda-

mên din yê malbatê bi hemû awayî xizmeta hereketa azadiyê dikin. Savaş Buldan tevî dehan kesên din bi awayekî hovane tê şehîdkirin. Gelek ji endanên malbatê an berê xwe didin çiyayên Kurdistanê, hinek awareyî başûrê Kurdistanê û hinek jî tene Ewropa. Rêzdar Nejdît Buldan di PKWD kar û xebatên xwe didomîne. Pervîn Buldan di nava dilê agirê dijmin de dimîne û xebatên siyasî didomîne. Ew nahêle ala xebata endamên din yê ku hatine şehîd û terorkirin an jî bi sedemên din yê fikirî-siyasî rûniştine, li erdê bimîne.

Nifşê sêyê yê wê malbatê ciwanên şervan û rewşenbîr in ku Evîn Buldan yek ji wana ye. Dema navê wê tê bira min, keda endamên din yê malbatê jî li ber çavê mine, lê ez ê li vira tenê weke bîranîneke kurt behsa wê bikim.

Naskirina Evînê

Min 'Evîn Buldan' bi rêya Azadiya Welat nas kir. Em her du ji eşîretê anku Oremarî ne, lê wê çî cara behsa wê mijarê nedikir. Carna bi rêya telefonê daxwaza hinek nivîsên taybetî li ser mijarên dîrokî û bi taybetî jî li ser rojhilatê Kurdistanê dikir. Di dengê wê de hezeke insanî hebû. Hurmetkar bû û nirxandinên wê yê siyasî kurt û watedar bûn. Kêma dia-

xivî lê bi wan risteyên kurt re bersivên cewherî didan. Ji-neke bi hemû wateya xwe kurdistanî û xwedî prensîbên şoreşgerî bû. Mutewazî û evîndara doza welatê xwe yê bîndest bû.

Xemeke veşartî

Salên piştê me li Amedê hev dît û di nêrîna yekê de min di çavên wê de 'xemeke veşartî', 'bêdengî û ponijîn' dîtîn. Zêdetir ji axaftinê mijûlî karkirinê bû. Liv û lebatên wê cidîyeta wê ya karkirinê didan diyarkirin. Kena wê siruştî û dema min li ser qedera malbatê pîrs jê dipîrsîn, gilî û gazinde nedikirin: "Em jî weke her malbatekê, êdî qedera me ji ya hemû kurdan cuda nîn e..."

Evîndareke doza rastiyê

Evîn Buldan evîndareke doza rastiyê û destkefteke şoreşa jinê li bakurê Kurdistanê ye. Him di qada ragehandina kurdî û him jî xebata siyasî-civakî de navê Evînê yê li kêleka navê wan keç û jinên şoreşger bimîne ku bi hemû heza xwe a ji jiyane re rûrastane canê

xwe fîdayî doza mirovahiyê kirin.

Heqîqetên dîrokî

Hezaran keçên weke wê bi ked û xwîna xwe jiyaneke nû pêşkêşî civata mirovahiyê kirin. Rêbaza wê malbatê ji hêla xwişk û bira, pismam û hemû hevalên wê ve berdewam e. Bedelên wan ji doza azadiya Kurdistanê re giran û ger gilî an jî rexneyek hebe lê wijdan nikare wiha rihet li kêleka rastî û heqîqetên dîrokî derbas bibe.

Qamûsa wijdanê

Jiyan kurt an jî dirêj rojekê yê bigihêje baregeha xwe ya dawiyê, lê di 'qamûsa wijdanê' de navê mirovên hêja û xwedî armanc nayên jibîrkirin.

Evîn tenê 27 salan (1990-2017) jiya lê jiyana wê pirbar bû.

Di hedê pênuşa min de nîne ez wesfa ewqas mezinahî û fedakariyên kesên wiha bikim, lê li vira ew a ku di dilê min de bû min anî ser kaxeze.

Bîra wan yê di bira me de bîne û hêvîdar im em bi kar û xebata xwe layîqî nav û keda wan kesan bin ku ji bo mayîn û hebûna me serî birin bin axa sar bêyê ku bigihin hezaran xweziyên ku dil di dil, mejî û riha wan de bûn.

Dotmama min

Ez ked û xizmeta dotmama xwe 'Evîn' a evîndara doza Kurdistanê qet ji bir nakim.

Ev kurtenivîs weke bîranîn li ser şehîd Evîn Buldan e, lê Cilo û Aryan jî tevî hezaran şehîd û rêvîngên din yê doza wan ya rewşa û meşrû jî qet û qet ji bîra wijdanên nera- ketî naçin.



Nivîsa kurdî

Selam Çinar

I

Nivîsa kurdî, di navbera tinaz û henekê da, di navbera hestiyariyê nexweşokî û di navbera aqilekî deh-dil û kodikşikayî', neberdewamî û serberdayî da, bi 'hêla çongan li pêyan dimîne.

II

Zimanê gazinan³ e, zimanekî ku bi hestî, bi dilşewitî heta qirikê dagirtî, episandî, dewisandî ye. Zimanê aqilekî quto, gepgepi, aqilekî bêreh û rîşal e.

Ev giş dikin ku nivîsa kurdî bê 'ser' û 'ber' be.

Mîrov gazinan carekê dike. Ji bo mestereya gazinê ev awayê gotina Ehmedê Xanî bes e: "Ger dê hebûya..."⁴. Li vir a ku hêjayî lêxebitîne ye, ruhîyeta lêkera hebûnê ya bi vî awayî ye. Wexta ku mirov dibêje "hebûya", yanî gava mirov gotinê weha lê dike, esil dixwaze bîrîneka nekewiyayî îşaret bike. Gazin e, hewar e, çespendin e. Piştî vê ne lazim e ziman bi vî awayî bigere. Mesela gazin û hewarê di çarçoveya deqeka temambûyî da (Mem û Zîn) hatiye zelalkirin.

III

Lihevîkirîneka ku ji tiraliyê (ji xeynî sedemên dîrokî, ne-berdewamiya çandî. Jixwe sedem ew in; lê ne ew in) ber digre li rastê ye û pirê caran 'bîr-bîrin' jî 'hest-bîrînek' a nehişî (derbxwarî...⁵.şermok) wê-datir nabe tu tişt.

IV

Peyv necotkirî⁶ mane.

— "Xweş çî ye?"

— "Xweş xweş e."

— "Temam, îcar xweş çî ye?"

Peyva "xweş"ê, çend sed sal in, hê jî "xweş" e. Di ferhengên da ji mane û şiroveya wê bêhtir, awayên wê yê zaravayan, yan peyvên nêzî wê li dû hev tîn nivîsîn. Jixwe hew ferheng dibêjin, ew jî ewqasî dibêjin. Derba ewil çî bîne bîra mirov ew e û hew.

Qey kes jî wê hêviya axaftinê nake.

Li ser meselê;

xweş [I] 1. baş 2. çê 3. qenc 4. Rind xweş [II] 1.

biçêj 2. Bitahm / Kerê reş, dixwe tiştê xweş"⁷

xweş: (hk.x.cewa) Xoş. xoş (hk.x.cewa) Bi tam.

Balkêş. Dilveker. Xweş. Evro rojeka xoşe. Xwarineke xoş ji mera çêke."⁸

Xweş: tiştê li gor dilî ye, tiştê mirov dixwaze bike / bibîne⁹

Xwe'ya di xweşê da, ne ya jibîrkirinê ye.

V

Peyva ku bi gotinê¹⁰ ber bigire û ya ku bi nivîsê ber bigire naşibe hev, li hev venabe, bi ser hev venabe. Zimanê sor, ku gelfî û newal xwe li berê ranagirin, li ber girêkên kor ê ku ne-"ber"-dewamiyê li hişê (bîra) nivîsa Kurdî xistîye, bûye potikek zipîziwa.

Gotar, helbest û çîrok û romana qels jî vî qumaşî ne.

VI

Peyvên kurdî kitim¹¹ in, bi serboriyên xwe li bîrê nehatine qeydkirin. Nehatine deqkirin. Weku her yek bi serê xwe be, di nav bendê helbestekê (cureyeka din a wêjeyê jî dibe) da li rastê ne û bê pêwendî ne.

Di sedsala dawî ya Kurdistanê da ev bela, heft-serî bûye.

VII

Nivîsa Kurdî bi 'behane'ya Ehmedê Xanî daketîye.

1- Kodik amûreka pîvana zad e.

2- Gelek caran bê referans e. Hem referansên dîrokî pir kêma in, hem jî yê navika peyvê. Mesele jî navika peyvê ye. Her car, a ku ji ber çavan difilite ev e.

3- 'Diyalogeka afirîner' bi Ehmedê Xanî ra, tiştê baş û hêja ye. Sebeba sedbareya gazinê, neberdewamiyê jî, çênekirina diyalogê ye. Belkî her kes dixwaze bibe nûxwiriye gelê xwe.

4- Xanî, Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, Beşê 5'an: "Ger dê hebûya me îtîfaqek, vêkra bikira me inqiyadek"

5- Di vî newalê da çî diqewime, nema kes dizane.

6- Hem bi maneya xwe ya sereke mane, hem xeyaleka bîreh û rîşal li wan nehatiye zêdekirin û hem jî nehatine cotkirin, beyar in.

7- Demîrhan Umîd, Ferhenga Destî, r. 496., Weşanên

8- Botî, Kamêran Silêman, Ferhenga Kamêran, r.

9- WQ Ferheng - Vê ferhengê pênasayek kirîye.

10- Kurd bi hezarê salan axivîne; li gorî gotinê, hema hema ne-nivîsîne.

11- Di nav dev û diranê axêverên xwe da.

Yew dewe, yew însôn

Semedê dewletan krîzêko pîl esto. Beno ke na rewşe de xeylê sîstemî bibedilîyî. Nêweşxaneyî nêzanê ke seba nêweşîya Vîrusê Korona se bikerî. Hezaran însônî nêweşî girewtî û mîlyonan însônî zî xo hepsê keye kerdî

Av. Cemîle
Turhalli



Dinya yew dew a. Heta nika ena qal ser zaf qalî ameyî vatêne. Eka dinya raştî zî biya yew dewe. Eka herçiqas ke ma vajî, dinya yew dew nîya zî dinya yew însôn tenya va. Raştî de heme însônî yew tenî. Yew nêweşî nêweşîya ma heminan a. Na nêweşîye beno ke biba nêweşîyêka globale. Nika ma heme vanî ke ma xo nêweşîye ra seyî bipavî. Heta eka devletê hegomonîkî reçete dayêne ma û na rewşe xemê înan de nêbî. Eka ê zî nêzonî se bikerî. Sîstemê weşî zerê nê kaosî de nêzono se bikerî. Zehfina dinya de, gêrayîş, rotiş, perwerde û şixulnayîş vînero. Endamê Ewropa Îtalya de 6 hezarî ra zêde însônî merdî... Hezaran însônî nêweşî girewtî û mîlyonan însônî zî xo hepsê keye kerdî û xo girewtî karantîna. Nêweşxaneyî nêzanê ke seba nêweşîya Covid19 (Vîrusê Korona) se bikerî. Zehfina însônî teber de mendî. Heqê weşîye nêmendî. Ewropa destê hetkarîye nêdono Îtalya. Ewropa û NATO semedê Îtalya çik nêkenî.

Îtalya rê tena Rûsya û Kuba ke dewletanê sosyalîst yê hemverê sîstemê Ewropa de yî, hetkarî danî. Semedê dewletan krîzêko pîl esto. Beno ke na rewşe de xeylê sîstemî bibedilîyî. Çin xo her ca de girewt karantîna. Spanya û Îtalya de qedexeyê tebervejîyayîşî esto. Amîraka de semedê asayîşî eskerî kotî teber. Îran çend hezar mehkuman vera da. Merkel market de kelupelan gêna. Trump vano "Wa herkes şîro karê xo ser." Spanya NATO ra yardım vazena. Her çayê dinya de herkes xo kerdo otoqedexe.

Tirkîya de se bena?

Tirkîya verçû ser nêweşîya globale nê girete serê xo. Heta ke nêweşî nêweşîya eşkerayî nêda. Reisê Tirkîya sere de va dua bikerêne û ma semedê patronan tedbîranê xo girewt. Roja bin Wezîrê Weşî Koca va "Keyeyanê xo ra mevejêne." Dima ra tebervejîyayîşê kesê emrê yin 65 serre bî û nêweşîyêka kronik yê înan estbî qedexê kerd. Îqtîdar semedê mahkuman qanûnê înfazî ard meclîs. Herkes zonû Cezaevî semedê na nêweşîye rîskêko pîl o. Vonî en qanûn ra ser 100 hezar însôn ra havila yi esta. La qanûn de semedê mahkumanê politîkan çik

çin o. Semedê tacîz û semedê sucanê krîmanalan ceza yena var, semedê mahkumanê politîkan çik nêkenî. Ay dava yin devomîj kenî tutukli vera nêdon.

Çend rojî verê honca qayyum dest na 5 şaredariyan ser. Serekê şaredariyan girewt bin çiman.

Kurdê muhalîfî girîyenê binê çim. Kurdan rê çik zî teqîr nêkenî. Yew mesela esta. Vonî yo merdim ra vatî "Ti çî biwazî ma di katê ci donî cironê to", ve ji vato "yew çimê mi vejêne." Meselê kurdan di çim vetiş o.

Dinya semedê weşîye xo gi-

rewta zerre. Tirkîya de zî dewlete kom muhalîf bo û semedê kurdan bêro mehneya statu înan sey tehdît hesibnena û ay gêna zerre. Nêwazena ê ke zerrede yî zî bukî teber. Gorê dewlete weşîye ra ver tehlukeyêko muhîm esto, o zî statuya Kurdon o.



Rojanê Qoraniye de Qese...

Nuray Atmaca

Kâm vatene kê roze yena, sevra nêweşîye teverbiyane millet mare bena tomete.

Na saretengeye giraniye de mare sê beno.

Domone mare tawa beno, nê beno. Meraq keme...

Meraq kerdayana ma, mare gegane bena movet(espîri). Tometbiyanede 65 serrura berz ison ke vejiya tever chirm(ceza) birnene.

Inson ke gosre nave na qerar tawa nebeno.

Hedere kokumina ma zerre de nino.

Kar û goriye xo bivo yakê ne-bivo sodir urzene ra ara xo kene çeye ra vejine sone suke sonde ki be vejine yena çeye xo. Nu biyowe kûltûre camardu.

Çê kare çeye kê esto pero postiya cini ku sero.

Qasê raştîye, simare vaji... Wasatename, cini û camerdu peverdaîs niyo.

Sawaji ez simara na sere ten-giye, nêweşîye cini û camerdu zare çeyede xepiskerd e

Juwin re bene nijde.watena, wastena sarekerdayana juwin ane-rave zon.û waht xuyane juwin rind naskene.

Sodir urzene ra piya ara xo kene, piya sone balkonde nesinero. Tae tûtûn (cixare) pisene ., hurde hurde qesane raver ane xo ver, qesekeni.

Geyane laxkene ho vira nikani. Raye de dorma xo de veng

dane cirano perso juvenra keni. oke raye de fetilino veng dane ! "nero lao lao tu sona kot suke kerda tomed, tora ceza birnene".

Oke dotra cave dano: "sima ra sebiyo! ez ne son suke. ezo xo re raye de fetelun. Musayi niyo zerrede ronîşer.

Kamke na weng hesna , zerrira vejine tever taye balkon de taye ki vere çeverde kutwe qeseykerdayene.

Waxte raver de na kombayine zaf biyene.

Ciranu pero juven naskerdene, juven pers kerdene juven ra diyax biyeni.

Hama zamane nikayen zaf çîye henin ne mando.

Endi keş keşi pers nekeno! endi keşi juven nê sone.

Ciran cirane hu nasnikene.

Kamile ma, pile ma wanekê; waxte made niya nebi. Germinina isonun biye. Kam suxre na dina ontene kare dina poste marebi. Haskerdayene mare kem nebiyene. Kom û qevil juwin perskerdene. post denewe juwin.

Na waht weşîya mawa virenera tua nemendo.

Çe saredejiye esta gosro çinerrano.

Cini veng dane juven. Niyadane camurd. Nê, seveta tersa merdine çede lawe made vinete.

Camurd onca kune we qese. "Simake pe ma sayılı niye, ma şime koti neverdane O binke viy bao! nero çee çee mao... Vindeme yakê nevindeme kamre çî. Ju bin; bira bira ma nika kata şime. Endi

biye mi kokim. Deste ma endi ne gureno. Waxte mao endi nisemero. Saki ma, seveta nêweşîye maneme.

Ax ax ! maveze! raver sekerdene millet, suke cadede ne keni tol.

Kokim niyadane ju cenc nao cerra yeno Nero lao tu çaya şîya tever, vane koraniye ama. Sanena millet tu nê tersena?.

"Apo ez çîra bitersi. Na Neweşîye sanena kokimu.


wişş nu sene qesa! Kokimura na çî vazena. Juke korani kotira zane? Kamiye de nêdana.

Raşt van sima kokime çeye de ronîşê. Heq dur beri korani ke ame sima teyna mirene. Keş nê verdane bere lewê sima. Lonet şîro çîye neninre. Na nêweşîye kamke peyda-kerda lonet şerowe dinu. İso, çîtur qirkerdena xo anu. Watena mi, niya rind bi na insanîyete çim vesano. Qe kokane xo ser niya nedano. Herçi vast qe ne vat ez herçîye cen, virazon fetelon ez gerekî hurinde pirkere. Ni birayeme na insanîyete rin biyo. Ma tua some der u berane xo hata son na suke de manemi,

Heya, to rast vana nara tîpa na insanîyete ez vaje zaf suke de ne maneme. Endi despera kami yeno pero sone devane xo, herde xo Ramine. Nika zûv çik mando? Tawa nê mando.

Kom û qewil, kamil û canuk ma, çene û xorte ma, serva xo, serva dina rinde , serva na nêweşîye bêdermane poşt bide. Juwinre diyax bire. Çera tewer mevejire!...





Dêreyê belek

Sarê di nava malbata xwe de keçeke bedew, jîr, ji xwe bawer lê hinekî jî serhişk e. Temenê wê nozdeh salî ye, ew jî hemû xwişk û birayên xwe cudatir e, di nava wan de tenê ew bêtiş û jêhatî ye. Helbet xwişk û birayên wê yên din jî jêhatî ne lê ew di nav wan de serreke ye. Bi şev û roj dikare bi tena serê xwe here hemû deran. Ji bo vê bêtişiyê, wê xwe bi dizî perwerde kiriye, li ser rûpelên mediyayê hemû xweparastinan hîn bûye.

Bi şev heywanek li çolê, li derva bimine Sarê diçe hewara wan, bi çend heb ciwanan re diçe wan dibîne û tîne. Her çiqas çend caran dê û bavê wê xwestibin wê asteng bikin jî lê bi ser neketin. Ew di wê ciwantiya xwe de pir serkeftî ye. Îca Sarê bi dilê xwe tenê nîne, dilê wê li ser kurê cinarên wan dike. Mûrad jî ne vala ye. Ew jî bi dizî li ser Sarê de dirêse (Ango bi dizî dilê wî/wê ketiye xortekî yan jî keçekekê).

Mûrad ev demeke dirêj e dixwaze ya dilê xwe bêje û jî wê nexweşiyê xelas bike. Sarê jî dixwaze Mûrad a di dilê xwe de veşartî ye jî Sarê re vebêje. Ez zêde dirêj nekim, ev di ewareke dereng de tîn ba hev û gotinên xwe dikin yek. Tenê di dawiyê de malbata gedê wê were xwezgîniyê. Roj derbas dibin, malbat tê xwezgîniyê. Ji Sarê dipirsin bê ka dibêje; erê yan na. Jixwe Sarê jî sala par ve gotiye erê. Hemû radibin amadekariyên dawetê dikin û dibêjin; pêşiya me bihar e, dema biharê em ê dawetek xweş bo wan herdu ciwanên xwe bikin.

Li cem me kurdan tivdarekên dawetan pir giran û dirêj in. Ha li vir de, ha li wir de, çendek maye ku dawetê bikin. Ji Sarê dixwazin ku biçê dikan bi dikan bigere û jî xwe re dêreyeke spî yê bûkaniyê ku di roja dawetê de li xwe dikin, bibîne. Ew dibêje na, ez naçim dikana û nastînim jî. Malbat matmayî dimînin û dibêjin; 'Çawa! Tu yê bê dêre daweta xwe bikî! Hemû bûkên weke te bi mehan dikan bi dikan digerin sewa ku jî xwe re dêreyekî bûkaniyê bibînin Tu çima naxwazî em nizanin.'

'Ka bêje ger tu naxwazî bizewicî em qedrê te digirin û malbatê re jî dibêjin; Mala we ava, keça me niha naxwaze bizewice, kesek jî te bi zorê dernaxe derve. Careke din dê jî bextê te re xortekî din derve.' Sarê vegehiya û got; 'Na, ne wisa ye, min jî xwe re dêreyekê bûkaniyê dirûtiye, dêreyê min heye. Ez naxwazim weke her kesên ku wan dêreyên spî li xwe dikin, ez dixwazim bila fikra min û rengê min a min bi xwe be. Min bi dizî jî xwe re dêre dirût, dêreyê min jî jî yên din cudatir e.' Sarê dêreyê xwe yê bûkaniyê nişani malbatê da. Kesek nikare jê re beje na, tu nikarî li xwe ki.

Ji bo dawetê hema çend rojek mabûn ku li seranserî çihanê nexweşiyek peyda bû. Gotin bila herkes di malên xwe de bin, kesek dernekeve derve û pir meriv neyên cem hev û hevûdu hembêz nekin. Sarê fikrî û got; 'Ez nizanîm em ê heta kengê bijîn.' Bi rêya telefonê fikrên xwe jî dildarê xwe re got, wan biryara xwe kirin yek. Rojekê di sibehêkê zû de, hemû gundî û cîran bi dengê muzîkeke govendê hişyar bûn û derketin ber derê xwe. Dîtin ku Sarê, dêreyê belek li xwe kiriyê, xêlyek avêtiye ser serê xwe. Mûrad jî cil û bergên zavatiyê li xwe kiriyê û her du jî li ser xanî ne. Gotin vaye îro daweta me ye, em nizanin wê ev nexweşî kengê jî nava me derve, lewma me xwest em jî niha ve daweta xwe bikin.

Hemû kes matmayî man. Di serî de jî malbata wan. Lê kesek jî wan gavek pêş de ne avêtin, hemûyan li ber derê xwe û di hundir mala xwe de tev li daweta wan bûn. Sarê bi dêreyê xwe yê belek bûbû bûkek weke tava rojê. Ew gihîşt mirada xwe lê heta niha tu gavek jî ne avêtiye derve...

Li malê bimînin, dernekevin derve, hevdu hez bikin û li hev xwedî dervekin...

Bi şewbê ketime

Ji sernavê nivîsê ne tirsin ji ber ku ez ne bi şewbê ketime, tenê ev sernavê pêkeniyeke kevne. Xwedê mirov bistirîne welehî van rojan mirov nikare bikuxe, jixwe pişandin dibe ku bibe sedema panîkeke mezin ji derdorê re. Lê divê mirov gazinan jî neke bêlome be.

Werhasilî em vegehin ser çîroka xalê Biro a xwarina kebabên xweş. Carekê mirovek dikeve rêyeke dirêj. Di rê de birçî dibe û dixwaze li xwarin-geheke li ser rêyê zikê xwe têr bike. Mêrik berê bihîştîye ku di rê de dema dît tir û kamyonên bar li cihekî rawestiyabin, ew tê wê wateyê ku xwarina wê derê xweş e. Di rê de çavê wî li xwaringehê ket ku gelek kamyon li ber ra-

westiyane. Biro di dilê xwe de got, ji vir çêtir cihekî din nîne. Biro wesayîta xwe rawestand û derbasî hundir bû, li ser maseyêkê rûnişt. Biro jî xwe re kebab xwest û di cih de servîsa wî amade bû. Biro beriya

ku goşt tam bike dît ku li kêleka wî dengê mirovekî û xwediyê xwaringehê zêde bû. Mêrik jî garson re dibêje bêhneke nexweş jî xwarina te tê. Garson heta jê hat sîleyek li bin guhê mêrik da û jê re got; 'Ez


qebûl nakim ku tu ji xwarina min xeber bidî.'

Garson paşê jî berê xwe da maseyêkê din û jê pirsî ka tu bêje bêhneke nexweş jî goştê min tê yan na. Mêrik jî tirsan re got, na abê bêhneke gelekî xweş jê tê, wek bêhna qeliyê ye. Garson sîleyek li wî jî da û jê re got: 'Ez jî derew û şelafîyan hez nakim.'

Ji nişkan ve garson hat ser serê Biro, sekinî û jê pirsî: 'Bira ka tu bêje kebabên min çawa ne, tu bêhneke nexweş jî wan tê yan na?' Tifa Biro di qirika wî de ziwa bû û newêriya bibêje ne erê ne jî na. Ji nişkan ve ev hat Biro û wiha bersiva xwe da: 'Welehî bira ez bi şewbê me bêhnan nakim ji kerema xwe dûrî min here malûm van rojan şewb talûke ye.'



XAÇEPIRS



Jİ ÇEPÊ BER BI RASTÊ

3. Çêj û tamê dide xwarinan, bêhna wê dijar e 5. Agir 7. Rengê spî 8. Noteyeke muzîkê 9. Xayîn, hevalbendê dijminê gelê xwe 13. Navekî jinan ê kevin 14. Dijberê sayî 16. Alaveke şer ê kevin 19. Navekî jinan 20. Sewaleke kedikîrî 21. Kevirê mezin 22. Rêxistîneke kurdistanî 25. Bersiva neyînî 26. Di rêziman de kesê kar dike, nanê ku ji arvanê garis çêdibe. 28. Axîn

Jİ JOR BER BI JÊR

1. Edalet 2. Biçe
3. Di tavê de reşahiya bi mirov re dimeşe. 4. Tav 6. Tixûb 10. Îş
11. Ronahî (Bi dimilî) 12. Pevçûn
15. Zimanê Rûsyayê
17. Jineke ku bû sembola berxwedana Kobanê 18. Mîsal
20. Destvekirî, comerd
23. Alaveke şer ê kolanan
24. Kinc
27. Cînaveke pir hejmar

Bersiva hefteya borî



Komediyê çar kom gihandin hev

Çar komên ku bi kurdî şanoyê dikin di projeyê hevpar de gihîştin hev. Komên şanoyê li ser medyaya civakî û televîzyonê amadekariya bernamêyê komediyê dikin

Bêrivan Kayi

Komên şanoyê; Teatra Jiyana Nû, Şanoya Bajêr a Amedê, Tiyatro Mencil û Şanoya Yekta li ser medyaya civakî bangewazî kirin ku amadekariya bernamêyê komediyê dikin. Şanoger Rûgeş Kirici û Yavûz Akkûzû têkildarî mijarê ji rojnemaya me re axivî.

Komên şanoyê li ser medyaya civakî daxuyanî dan û wiha gotin: “Em wek komên şanoya kurd ên ku navên wan derbas dibin li ser medyaya civakî û televîzyonê amadekariya bernamêyê komediyê dikin.” Hemû kes dikarin skecên ku nivîsandine ji wan re bişînin û li benda skecên kurdî ne.

Şanoger li benda skeçan in

Şanoger Rûgeş Kirici diyar kir ku demeke dirêj e dixwazîna bernamêyê komediyê çêbikin û wiha got: “Di vê projeyê de xaleke girîng ji nivîsandin e. Em dizanin ku li gelek deverên cihanê kesên afirîner hene lê derfet nabînin ku berhemên xwe pêşkeş bikin. Ev proje ji bo van kesan wek derfet e. Dikarin skecên nivîsandine ji me re bişînin. Rewş çî dibe bila bibe mîzaha kurdan her tim bi pêş ketiye.”

Ev sedsala platformên dijital e

Rûgeş Kirici bal kişand ser girîngiya xebata kolektîf û wiha axivî: “Hewce ye em hêza xwe bikin yek. Komên şanoyê yê di vê xebatê de cih digirin dê hem xebatên xwe bidomînin û hem jî tev li vê projeyê bibin. Em dikarin hinek xebatên xwe bi rêya platformên dijital bigihînin temaşevan. Em dizanin ku ev sedsala platformên dijital e. Êdî hemû kes li malê xwe digihînin hemû cihanê û em jî dixwazîna xwe bigihînin hemû deverên cihanê.”

Kirici bi bir xist ku beriya berbelavbûna vîrusa koronayê wan ev proje amade kiriyê û ji ber ku niha hemû kes li malê ne, ji bo nivîsandina skecan derfeteke baş e. Kirici da zanî ku televîzyon dezenformasyonê mezîna çêdikin û divê li hemberî wan bernamêyên kurdî û hunerê bêhtir bîn çêkirin. Kirici herî dawî got ku li dijî astengiyên dîsa jî berhemên xwe digihînin hezkiriyên şanoyê.

Erênî û neyînîyên dijitalê

Şanoger Yavûz Akkûzû jî bal kişand ser aliyên erênî û neyînî yê şanoya bi rêya platformên dijital û wiha got: “Em bi temamî derbasî şanoya li ser dijitalê nabin.

Heta şewba vîrusa koronayê derbas bibe belkî em skecên xwe li ser youtubeyê biweşînin. Ger korona demeke dirêj dewam bike em nikarin behsa şanoyê bikin. Ji ber ku şano jî listikvan, mekanek vekirî û temaşevan pêk tê. A niha têkiliya me bi temaşevan re qut bûye.”

Akkûzû da zanî ku ger şewba vîrusa koronayê dewam bike ne pêkan e komên şanoyê bîn cem hev û wiha got: “Em ê skecên ku temaşevan ji me re bişînin hilbijêrin. Her komeke şanoyê belkî werin cem hev bi du-sê kesan, qeydê xwe bikişînin û em ê di qanala ‘youtubeyê’ ya ku em vekin de parve bikin. Mînak Şanoya Bajêr a Amedê yek kişand dê bavêje ser kanalê. Komên din jî bi heman awahî dê listikên xwe biavê-



jin ser kanalê.”

Yavûz Akkûzû destnîşan kir ku gelek kes niha li mala xwe ne û dikarin skecên bi kurdî binivîsin û dixwazîna bi nivîsandina listikên kurdî temaşevan jî aktîf bikin.

Bêyî civakê şano nabe

Yavûz Akkûzû di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser girîngiya şanoyê ku bingeha xwe ji ritûelên civakî girtiye û diyar kir ku dema şewba koronayê bi vê lezê berdewam bike dê şano di rojên xerab de bifetise û wiha got: “Civakên rojhilatî û bi-

taybetî jî civaka kurdê yekê baş dizanin ku şano ji ritûelên mîna Newrozê, ritûelên sersalê, ji ritûelên şînê, ji ritûelên dema ku zeviyên xwe diçînin ritûelên reqş û dengbêjiyê pêk tên. Ev ritûel tev jî di çanda kurdî de hene û gelekî dewlemend in. Em dikarin bêjin ku van ritûelan şano ava kir. Dema civak tune be şano jî dê tune be! Auraya listikvan û temaşevan dema bigihêje hev, wê demê şano dibe şano. Yanî temasa temaşevan nebe nabe. Tenê ji bo demeke kin em ê li ser platformên dijital bernamêyên xwe bidomînin.”



Weswese 2

Şener Ozmen

Şewata di nameyan de

Ji bilî ragihandina rewşê û agahiyan, bi min name –xasma jî yê hûbê û yê ku bi tu rê û rêzikan ve negirêdayî– pariyekî ji vebêjeya gilî û gazincan e ya ku hema di henga hinartinê de dil û hinav jî (bêguman yê sotî ku ne bi tenê wek nigâşî, bêhtir wek veguhastina hestên ku colî ser serê şandiyarê/i bûne) pê re diçe. Di rûbirûbûnê de ji wê/wî kesê/i ku jê re ‘name’ tên nivîsandin (şandin qonaxeke din e), arezû û daxwaza ku dibe sedema bingehe û name nivîsinê, bo demeke kurt ji holê rake jî, nabe dî û dermaneke heta hetayê. Çi kû name, xasma jî yê nûseran, şer û pevçûneke din e ya ku di çihana zarbar ya peyvan de tê birêvebirin. Êdî ne girîng e wekî bervêderêkê/i nameyê hebe, lewre ji bo cihanê gîşî hatiye nivîsandin. Mayakovskî jî Lilîyê re ta bi derziyê ve dikir: “Rojê pê ve bes li tiştekeî difîkirim, gelo, qasek bi şûn de ez ê ti nameyan ji te werbigirim yan na? Ji ber hindê ye ku bila nameyan te ji yê min.” Kafka Milenayê di xewna xwe de didît: “Tu dibîyî ez, ez dibûm tu, paşê, nizanim bê çawan, êgir bi laşê te diket, êgir bi paçêkî dibat vemirandin û bi sakoyekî ku ketibû destê min, min radibû li te dixist...”

Gava min nameyên di pirtûka Firat Cewerîyî’ de xwendin –bi ya min berhemeke gelekî hêja ye–, ji xên heqîqeta kambax û deroderbûnê ya ku Tanîn Molnaxadêya Mîdyayî –qasek bi şûn de ez ê behs jî bikim–, bi boneya derketina kovara Jîmê, di nameya xwe ya sedsala çuyî de nivîsandî de qal dikir hate bira min ku bi van nameyan re, heqîqeteke din jî ku mêr ew fena razekî li pişt heft deriyên pola veşartîbûn, derdiket mexderê. Ne ku wejeya kurdî lap di destê mîran de bû û serbara ser jî, tunebûna nivîskar, her weha xwînerên jin bûn, nexêr, ev jî hebû, belam kêşe, di pênasekirina heqîqetê de bû, ku bi çiroka şert û mercên welêt re (reva me ya jênager) rê li ber bişaftîneke din re vekiribû.

Jin, katibên me bûn û nusxeyên me yê berbelav li tilnivîskê dixistin. Jin, wêneyên me yê zerhîmî berhev dikirin û ew li gorî xebatên me yê giranbuha disenifandin. Jin, dayika zarowan bûn û di nameyan de, bi tenê hêjayî kêfxweşîdanekê jî rêzê dibatîtin. Razek wisa bû ku Charles Baudelaire di *Diltengiya Parisê* de digot, “*Kêlîyekê min bewl da wekî serwest bibim bê ve raza han çî ye ne çî ye; dî re xemariyêkê jê nêrev xwe da ser dilê min û di bin nîrê wê bêxemiye de, ji wan yê ku cinawirên xwe hilgirtibûn bêhtir ji çokan ketim.*” Wekî ku hebûna wan bi tenê bi vê raza ku ez bixwe jî nizanim bê çî ye, kîp girêdayî be. Dîrok? Nexêr, ev çemka han, di boçûnê Derridayê de weke navêkî taybet hatibû bikaranîn. Derrida di berhema xwe ya bi navê *Act of Literature* yê de, li ser helbestên Paul Celanî hûr bûbû û di boçûna xwe de sê xalên sereke danibûn pêşiya me, ku yek ji van jî, hêjayiya nameyê bû, ya ku di nav sinorên sexta remzan de (wek destnîşankirina çî, dîrok û saatê) mabû; “*Herkesê/a ku sal, roj, çî, bi kurtayî ya/yê ku mewcûdiyeta ‘li vir û niha’yê*

tomar dîke, di vêkîra tomarkirinê de dibe şabidê mewcûdiyeta xwe jî.” Lêbelê a min bêhtir şaşûmetelmanek bû li hember nameya kurt a Rewşen Xanimê ya ku bi tirkî nivîsandibû! Ku em bîn ser nameya *Tanîn Molnaxadêya Mîdyayî*, bi gotinê Sylvia Plathê bi-bêjin; “*Belkî jî hemû ew nameyên boçûna bişê qîştik û bizdîyayî, ji nû ve û ji nû ve qal jî ve dîlîbêjîyê, jî ve rêşşayîşên ku ji nişka ve derdiketin holê, dikir.*”

Di 25’ê rêbendana sala 1918’an de (Qanûn-i Sanî 1335) bi şûnenavê *Tanîn Molnaxadêya Mîdyayî* (Mîdyali Tanîn Molnaxadê), di kovara ‘JÎN’ê de [Çapxaneyê Necm-i İstiqlal, Hejmar 9] nameya mamosteyekê/i hatibû weşandin ku di *munderecat*’ê (navrok) hejmara navborî de, wekî din çî salix û silûxnehatibûn dayî. Name ji desteya rêveberiya payebilind a kovarê re hatibû şandin ya ku bi van gotinên bexşînxwaz (ku han dida me wekî em ên tîkçuyî, li tîkçûnê toreyê dab û nerîten kurdwayîya sedsala bîstan ya li Stenbolê bercestebûyî vebigerin) dest pê dikir; “*Ez/benî! Ji tîrs û şayîşa ku ez ê nikaribim li ser gotina xwe bimînim, li hem-*


berî komeleya we bi rastî jî fedîkar û dilzîz im. Çend sedem hene wekî rê li ber pêkanîna ve peyvirê girtine û bêviya min ew e ku bi pêşkeşkirina van, beşa we jî bi dest bîcîm. Ya yekan, şewata ku mal û milkê min pê re çûbû bû, ya ku ez jî bi xwe re tîkçûnim. Vê kaesatê kir ku ez karîna xwe ya hizrî wenda bikim ya ku xwebûna min jî noqî nav reşariyê kiriyê. Ya duduyan, bi bandora ruxîner a vê kaesatê, ev demeke e bi çî ve hatime girêdan. Ya siseyan (hênceta min a berî mezîna ev e) ji bextreşîya min e ya ku dest nade wekî li pêşberî neteweya xwe ya torin û mîrxas, çend rêzikan li xameyê xîm.”

Ne Stî Tanînê û ne jî desteya kovarê, di der heqê vê şewatê de çî agahî nedabûn ber destê xwîneran, wekî kîjan şewat bû, di kîjan salê de û li ku qewimibû. Lêbelê, li gorî agahiyan ku Agirkujîya Stenbolê didan, di sala 1918’an de, ango di nav salekê de li van deverên Stenbolê şewat derketibûn; li Yenikoyê 80 xanî, li Uskudarê 82 xanî, di salê li Uskudarê 230 xanî, li

Cibali-Altimermerê 7500 xanî, li Büyükdereyê 78 xanî, li Vefayê 500 û li Kasimpaşayê 381 xanî şewitibûn. Helbet, em bi esehî nîzanîna wekî qala şewata li kîjan deverê dikir, ya ku ew bi çî ve girêdabû. Hagop Baronyan, di pirtûka xwe ya bi navê *İstanbul Mahallelerinde Bir Gezi* yê de (Geşt û Gerek Di Kûçeyên Stenbolê De), gava qala Gedikpaşayê dikir, meseleya şewatê jî dînan zimên; “*Şênîyên ve taxê jî zimane hevûdin fam nakin, zimane wan li nav hev ketiye. Ji şewata dawîn ve ye ku ji bemi taxên Stenbolê û keçberên ku ji Anatolyayê hatine, qesta vir kirine.*”

Tanîn Xanê, pariyek di pêş de, qala dîrketina xwe ya jî welêt dikir ya ku bi dî bûyereke diltezin re rû dabû û çaxa bi malbatî terka Kurdistanê kiribû jî, li gorî ku digot, ew hîn zarok bû: “*Ez kurd im û bi kurdîyîna xwe jî şanaz im. Mixabin seba kaesatekê ku bi mirinê encam da, bîn ez zaro bûm me terka welêt da. Ji ber ku di der heqê neteweya xwe de vekolin û zanîyariyên min nîn in û ji bo rîpelên kovareke payebilind a fena JÎN’ê, bi nîvîsarên xwe yê bêvax, pelepîç û paşmayî neberimînim, jî ve rûmetê bêpar mam. Van nîvîsarên min yê bêqîmet yê di navbera hilatina bîr û boçûnê ronak û zengîniya berfirêb de, dê çîyekî beredayî bigirtana.*” Stî Tanînê derdê dilê xwe dirêt, wekî çawan û bi çî hêviyan dest bi mamostatîyê kiribû ku îro ro kesera dilê xwe jê birî be jî, mala felekê bişewite nikaribû bibe mamosteyê qewî jî bo zarokên belengaz yê gelê xwe yî bixîret ku hatibûn jîbîrkirin.

A girîng feraset û dilnîzmi ye –yan jî diviya wisan bûya– ya ku her ku diçe kêmîtir dibe û pozpîlîndîyê ku hêza xwe jî famkariyêke vegir digire, tê û dikeve şûnê. “*Ji ber ku ji bêla zanîna û xuyapakîyê ve xwe ji we gelek û gelek kêmbûnîm, newêrekîya min bibexşînim.*” Em jî nameyê tîdîgîhan wekî Stî Tanînê, gelş û gelemşeyên gelê xwe, weke pîrsgirêkeke neteweyî û dadmendîyê (hiqîqê) didît.





Bîlal Ata
Aktaş

Dîrokçeya sosyo-polîtîk a hîjyenê

I. Montenegro

Di van demên koronayê de ku ti kes nikare pêşîra xwe jê xilas bike, gelek term û remzên jirêzê ji cardin ketin rojevê. Tiştên ku di nav jiyana rojane da nayên bira mirovan, di demên wiha da bêhtir mohîm in. Çimkî wekî hemû tiştên civakî ev term ji çêkirî ne û rastiya wan bi tenê girêdayî bawerîya me ye. Hege em jê qanih bibin rast, nebin ne rast in. Wekî hemû ol, dewlet, şirket û marqeyan.

Hijyen jî yek ji wan terman e ku bivê nevé dîsa kete rojevê. Ev peyv bi xwe, bi wateya ku em iro bi kar tinin konseptê nû ye. Ji hêla etimolojiyê ve jî peyveke yewnanî ya latinîzekirî tê ku tê maneya hunera tendûristiyê. Êdî bi wateya paqijiyê tê xebitandin lê eseh maneya wê jî vêya firehtir e. Tê wateya hemû tiştên ku ji bo paqijiyê tên kirin. Bi vê nivîsê ez ê bi nihêrîneke kurt li dîrokçeya hîjyenê ya li Ewropayê binêrim.

Hijyen, heya sedsala 19'em ne ewqasî di rojê girseyan de bû. Jixwe çavkaniya nexweşînan jî pirrî caran nedihate zanîn. Ji bo tîmar û tedawiye rê û rêbazên xeternak û bêfejde dihatin xebitandin. Bi serda jî, alema zanîstê demeke dirêj jî bandora mikrob û organizmayên biçûk hayedar nebûn. (Bakterî sedsala 17'em, vîrûs jî dawîya 19'em ancax hatin kifşkirin). Bawerîyeke wilo berbelav bû ku nexweşînan jî bêhna pîs tê (teoriya mîazmayê).¹

Loma di pandemiya qerase ya sedsala 14'em da ku qirra milletê anî û bi tevahî nêzi 150-200 milyon insan pê mirin, dixtorên bo dermankirina wê nexweşîne peywardar, maskeyên mîna nikila qijikan didan ber pozê xwe û çêçêkên bêhnweş dixistin berê da ku xwe ji nexweşîne biparêzên. Îja dixtorên wê çaxê wilo bin, êdî millet çawa bûne hûn bifikirin.²

Di serdama navîn de gava ku şof û şewbek (epidemî) dest pê dikir, dixtoran nedizani ka nexweşînan çawa belav dibe. Hay jê tunebûn ka qirra milletê ji ber temaseke laşî ye an bi hewayê bixwe belav dibe. Loma gava ku dixtoran yek tedawî dikir, bi heman melzemeyan diçûn tedawiya kesekî/e din jî. Helbet nexweşînan bi vî hawî her belav dibû. Jixwe millet bixwe jî nedizani ka ber-tekeke çawa nişan bide. Ji wan tirê sedema nexweşînan çavkaniya xwe jî derve digirt. Civakê bixwe wekî hemû demên qeyranê, kesên biyanî an belengaz tawanbar dikirin ku hêzeke wan a çekî an otorîter tunebû û ji qada giştî bêpar bûn. Çawa ku iro penaber wek sedema gelek pirsgerêkên modern tên ditin, ew jî wisa. Her du gelemşeyên kûrapê hevdu ne.

Ji ber vê hindê, civakên wê demê jî xwe re çareyek dit û sûr û diwarên bajarîyan bi ser biyanî û xerîban de girtin. Kes an tiştên nenas bo niştecîhan bûbûn cihê tirsê. Di encama vê bawerîyê da dijminatîya "yên din" zêde bû û gelek kom û kesên ji periferiyê bûn qurbanîya vê bawerîyê serdest. Bi hezaran cihû hatin qetilkirin. Extiyar û jinên bi jî bajêr hatin dîrxistin. Di Decamerona Boccaccio da, ev tabloya hanê bi mit û efsaneyên seyr hatiyê



nivîsîn ku hin ji wan koka xwe jî kulturên rojhilatê digirin. Boccaccio, wilo qal dike ku ev hesta biyanîbûnê (alienation) ewqas belav dibe ku piştî demekê de û bav bixwe zarokên xwe yên nexweş qebûl nakin. Keza zarok jî de û bavên xwe. Kitêb di dema pandemiya de qala deh hevalan dike ku di bin karantînayê de jî aciziyê her yek 10 çirokan vedibêje. Bi temamî 100 çirokên satîrik, trajîk û erotîk. Xebateke muazzam e. Heman mijar di xebatên William Bowsky û Elizabeth Carpentier de jî bi awayekî akademîk cih digire.

Gereg jî ber çavan neflîte, di sedsala 14'em de, hêla zanîstî ya vê epidemiyê nedihate zanîn. Loma ev nexweşînan bixwe jî bûyereke tendûristî bêtir rewşeke civakî û polîtîk bû. Berovajî baweriyên belavbûyî, ev nexweşînan fîceten nehatiye û koka milletê neaniye. Bereks, heya destpêka sedsala 18'em bandora xwe li seranserê Ewropayê bi gurahiye cihê daye hesandin û hingê li gor çavkaniyan jî sedî 30 heya 50'yî jî nifûsê daye ber xwe û jî holê rakirîye.

Helbet jî bo rewşên awarte bergiriyên awarte divê. Bi vê şewbê dezgeh û saziyên dewletê xurttir bûn. Çimkî hêzeke qerase diviyabû bo qontrolkirina civakê. Mîsal jî bo tîkoşîna li dijî epidemiyê dezgehên taybet hatin damezirandin li bakurê Îtalyayê. Ev dezgeh ewçend xurt bûn ku jî şilkê heya şimikê dikaribûn li ser jiyana rojane biryarê bigirin wê dirûst bikin. Van dezgehên, bi rêya van epidemiyên bere bere hêzên xwe xurttir kirin û bûn bingeha sistema tendûristiyê ya Îtalyayê û paşê jî ya Ewropayê bixwe. Kesên ku li van dezgehên dixebitîn ji tedricên dibin xwedî gotin û giraniya wan di siyasê de jî çêdibe. Foucault, di dersên xwe yê jî bo College de France³ de behsa hêza qontrolkirina desthilatê dike⁴ û analîza desthilatdariyê bi rêya nexweşînanê kotî, weba û xuriyê rave dike. Li gor wî, wexta ku şewbek xwe da der, desthilatdar dişê bergiriyên sedî sed jêv cuda bigire jî bo dirûstkirina civakê. Mîsal gava ku weba derdikeve dewlet bi karantînayê nabêle

kes derkeve (inclusion) lê gava ku kotîbûn belav dibe nabêle kes bikeve bajêr (exclusion). Ev jî nişaneyê veşerlokîtiya (flexibility) hêza qerase ye. Rêziknameyên wê demê jî loda vê hêzê her zêde dikin. Çimkî anegorî van rêziknameyan desthilatdar diyar dikir ka çî li ku derê çawa bête kirin, kî li ku derê bi çî awayî bimîne hwd.

Lê belê digel wê hêza ezamet, gel bixwe jî bertekên xwe nişan didan. Lê jî hişmendiyê polîtîk bêtir jî ber sedemên tirsê. Helbet ev norm nîne lê mîsal gava ku qontrol çêdibû an jî nexweşî dikete nav gelan, millet xwe vedîşt û gava ku nexweşek hebûya jî jî rayedaran re nedigotin. Ji hêla din ve wekî her caran kesên zengîn xwedî derfetên lojîstîk û aborî bûn ku xwe ji cihên epidemiyê dûr bixin. Lê çinên binemayî her diman di bin qontrola hêza qerase ya dewletê da.

Wek encama vê webayê, bi kurtasî, bi qewlê hin rewşên bîran ve jî ber kêmbûna nifûsê hevşengî hatiyê parastin, lê bi ber qirkirina daristanan hatiyê girtin û vê jî bandoreke erênî çêkirîye li ser tendûristiya giştî. Ji bilî vê avahîsaziya Ewropayê hatiyê guhertin, feodalîzm lewaz bûye, lê bi ber dagirkirinên Osmanîyan vebûye.

II. Reykjavîk

Piştî serdema navîn heya ya 20'em, hîjyen bixwe xwedî pratîkên dîrî zemanê me bû. Demeke dirêj, pergaleke giştî ya sereb û kîzîne (qanalîzasyon) tunebû li Ewropayê. Yê ku toleta xwe dikirin nedîçûn ser avê. Jixwe av bixwe bi maneya iro nişaneyê hîjyenê nebû. Bawerîyeke wilo hebû ku ava germ hêza laşî lewaz dike. Loma ye ku serîneşûştin wek nişaneyê aristokratîyê dihatê hesibandin. Li gor gotegotekê, Louisyê 14'em di jiyana xwe da bes carek tenê serê xwe şuştîye. Bi egereke gîr ev jî gotegotekê wêdetir ne agahiyek e lê belê jî bo nişandana hişmendîya wan çaxan minakeke ecêb e. Hingê yê serê xwe dişuştin yan diçûn serşokên giştî yan di nav kurn an sîtilan da bi potan laşê xwe paqijî dikirin an jî diçûn çem û kaniyan. Di malan de jî bo serşokê

cihên taybet tunebûn. Qesra Versayê ku xwedî 700 odeyan e ne xwedî zêdetirê çar-pênc toletan bû. Di raporên balyoz û qonsolosan da eyan e ku jî bêhna genî mirovê gîj dibû li Versayê. Di baxçeyê qerase yê qesrê de danîna darên pûrteqalê jî ji ber xilasbûna vê bêhnê bû.

Sersok li derekê, çiroka toletan hîncêbtir e. Di demên Împaratoriya Romayê de, gûkirin karekî şexsî nebû. Ji bo toletên giştî çend qûlik li cem hev dikolan û bi qaroyan bilind dikirin. Yê ku îşê xwe dikirin hima li kêleka hevdu bûn. Ango toletên wê çaxê cihên sosyalîzebûnê bûn. Yê/a gûyê xwe dikir bi darekî ku di serê wî de sîngerek hebû, qûna xwe paqijî dikir û diçû. Yê/a dû jî bi heman darîkî.

Ji demên Romayê heya sedsala 20'em gûkirina kesekî/ê nişaneyê çîna wî/ê bixwe bû jî. Yê zengîn di salonen xwe de, di nav qab û qaçaxên rengin û porselan de, yê feqîr di nav sîtil û beroşên teneke de îşên xwe hel dikirin û hê paşê jî paceyan davêtin orta re ku rojê hege ne bi sedan be, bi dahan kes jê derbas dibûn. Yê li derve jî diçûn robar û kaniyan. Jixwe hege em binin bira xwe ku metropolên sereke yê Ewropayê, mîna Berlin, Paris an Londonê xwedî robar û çeman in, îja bi serda jî ava vewxarinê jî ji wan robar û çeman temîn dibû, xetereya mezin de hîncêltir be.

Di heman demê de di sûrên bajêr da jî qul û quletengên cuda hebûn jî bo ritîne ku jê re garderobe (kinc-dank) dihatê gotin. Bi vî hawî em tîkiliya gûkirinê û salonan dibînin. Heta karekî bi navê alîkarê gûyê keyî (the groom of the king's stool) hebû ku bes peywira wî paqijîkirina gûyê keyî bû. Balê nedin ser navê vî îşî, ev kar bixwe nedibû nesibê her kesî û yê ku dibûn alîkar, pirranî jî zar û zêçên aristokratîyan dihatin hîlbijartin. Karekî biperestîj bû.

Di hişmendîya civakên wê çaxê de kubarî jî paqijiyê girîngtir bû û carna jî bo ku ji mêvanan re bêhurmetî nebe xwediyê malê destê xwe nedîşt.

Di sedsala 16'em da şairekî bi navê John Harrington cara ewil toleteke bişifon (flushing toilet) çêkir jî

bo Elizabetha keybanûya Britanyayê. Lê bi hinceta ku zehf deng derdixe, Elizabethê ew bes du sê caran xebitandin. Piştî şoreşa endustriyê bajarên qelebalix dihatê maneya cihûwarên bi bêhna genî. Loma şert û mercên wê demê zor dida ku çareseriyek bête ditin. Di 1880'an de camêrekî bi navê Thomas Crapper şîya ku toletên bişifon bêdeeng bide xebitandin û ev yek jî rê li ber belavbûna vê toletê vekir pêşî li Londonê hê paşê li Ewropayê.

Qodên hîjyenê jî şarîstaniyên berê heya niha her ku çû şikleki cuda girte ser xwe û hê jî digire. Di demên awarte de ne tenê ehd û xisletên me yê bijarte diguherin, lê belê xûy û kirinên me yê rojane û jirêzê jî jî vê guherînê para xwe digirin.

¹Ev teorî paşê di salên 1880'yî de cihê xwe ji teoriya mikrobê re bişt (germ theory of disease).

²Ev meseleya bêhna qirîjîyê yek ji bertekên berî sîrîstî ya cisnê me ye. Bêhna qirîjî an şiklê xirab di derbîşa me de hesta talûkeyê dilebitîne. Ji demên berê de sînyalê dide ku em xwe ji wan tiştên deforme û bêhnqirîjî dûr bixînin. Ji ber vê sedemê ye ku dilê jîneke ducanî jî gelek xvarin û vevxvarinan li hev dikeve ku di demên asayî de xvarin an vevxvarina wan ne pîrsgerêk e. Gava ku metabolîzmaya jîneke ducanî li şîna jî bo kesekê bixebite jî bo du kesan dixebite, laş pergala bezşangê (immune system) hêdî dike û ev yek jî rê li ber vîrûs û mikrobên celeb celebî vedike. Çimkî laş xwe diparêze û wek tev-dîr xwe ji hin xvarin û alîmentasyonan dûr diçe. Ev bertek, bertekê gelek seretayî (prîmitîv) û heya raddeyekê kêrbatiye. (Ji bo agahîyê berfireh binêre: Robert Winston, Human Instinct (Dozîna Mirovî)).

³Ev der jî teref Françoisyê (fransoa) Yekemî keyê Fransayê ve di sala 1530'î da hatiyê avakirin. Ev sazî jî wê çaxê beta nîba li perverdehiya xwe berdanam e. Yek jî saziyên berî biperestîj e û her kesê ku dixwaze dikare bîyî qeyd û heqdestekê dersan teqib bike. Gelek xwende û bîrewerên Fransayê li vîr ders dane. Foucault jî yek ji wan e.

⁴Ji bo berhevkerîneke bi tîrkî binêre: Güvenlik, Toprak, Nifus: College de France Derstî (1977 - 78), Bilgi Üniversitesi Yayınları.